



# “Çelka herî bîtesîl Fâstî li Xwe ye...”

Rûpel 8-9

Girtî li ber mirinê ne:

**Rayedarên dewletê  
dîsa sê meymûnan  
dilîzin**

Rûpel 3

Çalakiyên HABIBAT'ê bi teşqeleyê qedîyan

**Habitata polîsan  
zora ya Neteweyêن  
Yekbûyî bir**

Rûpel 4

90 kurdên ji rojhilat di grevê de ne


**Turkiye kurdên rojhilat  
wekî penaber  
qebûl nake**

Rûpel 5




, i Negwînê  
çend helbestên bijartî

10



R. Dilovan li ser Şakiroyê  
Dengbêj nivîsî: Kewê ribat

11



12

Çiroka Jêhat Gimgim:  
Ala di warê xelasiyê de

## Ji Xwendevan

**BI** derketina vê rojnameya me yî birûmet berî her tiştî em pir këfweş û dilşad dibin û zimanê neteweyî hîn dibin. Ev jî, ji bona me gelê kurd gaveke gîring e. Daxwaziya me, hevalênu ku vê rojnameyê ku dixwînin tenê bi xwe sînor nehêlin, li gorî derfeta xwe bigihînin hemû kesan ku zimanê neteweyî di demeke kurt de cih bigire.

Di dawiya gotina xwe de em girtiyen Girtigeha Bartinê, ji hemû xebatkar û amadekarê Azadiya Welat re silavêne şoreşerî bi germî dişinîn.

**A. KADIR ÇİFTÇİ**


**EZ** di pêşiyê de silavêne xwe yênil dilgermî ji xebatkarêne rojnameya Azadiya Welat re dişinîm. Ev xebata ku hûn di bin hemû zilm û zordesiya dijimin de dimeşînin, em pê iftîxar dîkin. Em hêvi dîkin ku rojén û salên li pêş me, bibin roj û salên aştiyê, azadiyê, serxwebûne. Di xebata we de serkeftin.

**MUHAMMED OĞUZ/ SERT**

**JI** ber ku rojname bi kurmancî derdi keve û rojname li zimanê gel xwedî derdikeve û pêşketina gel ji xwe re kiriye armanc, ez ji rojnameyê û hemû xebatkarêne rojnameyê re serkeftinê dixwazim.

Bi hêviya rojén azad û serbixwe. Bimînîn di nav xweşiyê de.

**BAHATTİN/STENBOL**



## Têkoşîna ji bo şexsiyetê û ya li hemberî wê

MEHMET GEMSİZ

**D**îsa girtîgeh, dîsa êrş û tehdeyên li ser girtiyan. Ev her du têgîn (terîm) "girtî" û "girtîgeh", dîsa di rojeva me de ne. Carinan tiştinen din serî ji wan distîn û ew li paş dimînîn. Ji ber ku civaka me gelek bi liv û tevger e.

Îcar ev her du têgîn bi tevgera azadiyê re bi awayekî gur û pir ketin rojeva gelê kurd. Civaka kurd bi hemû çin û tebeqeyên xwe ve, bi van têgînan radikeve û radibe.

Berê bi qandî iro ev her du pevv ji kurdan re ev çend ne gîring bûn. Heta zêde-ne xwedîmane bûn jî. Bi taybetî li bakurê welêt ev rewş wiha bû.

Kurd bi jinemîr, bi zar û zêc wekî pişti salên 80'yan neçûbûn ber deriyen zîndanan û gelek tehde û stem ji polîs û leşkerên ber deriyen zîndanan didîtin ku hîna jî dibînîn. her tişt dijberê xwe di hun-

dirê xwe de dihewîne. Wan tehde, lêdan, îskence û hegaretan kirin ku ew kesen diçin seredana dîl û girtiyen xwe, hişyar bibin û tê bigihin ka çima zarokên wan li 'hundir' in.

Divê qenc bê zanîn ku çima li girtîgehan ev çend bûyer diqewimin, ev çend tehde, îskence, lêdan heye? Ji girtiyan çîtê xwestin, ma girtibûn ne bes e ji bo wan zaliman û hwd...?

Jixwe, çaxa ku mirov bersiva van pîsan bide, mesele eşkere dibe. Ew ji girtiyan dixwazin ku ruhê xwe, şexsiyeta xwe, îradeya xwe jî teslîmî wan bikin. Gava ku girtiyek, dîlek van daxwazên wan bîne cih, êdî ew diqede û namîne. Bérûmet û serpêl dibe. Dibe mirovîkî şikestî. Jixwe çaxa şikestî bibe, pê re ne xwebawerî û ne jî xwehêzî dimîne.

Em dikarin bibêjin êdî ew ji qewmê

kewê ye.

Ji bo serdestan, maneyeke girîng a gitteghê heye. Ew jî ev e: Tîmarkirin. Lewre ji bo wan girtîgeh, tîmarxane ye jî.

Sedema siyaseta wan a li zîndanan ev e. Bi wê tîmarê, dixwazin mirovîn pûc vala, mirovîn pêleyistî, mirovîn bêcweher biafirînin. Wan bêşexsiyet bikin.

Li Zîndana Amedê, pişî derbeya leşkerî bi wê hovîtî û direndetîyê, xwestin vê siyaseta xwe biçespîn (tetbîq bikin), lê bi ser neketin. Girtiyen azadiyê bersiva "Berdîlê her tiştî heye, berdêla me jî bedena me ye" gotin wan, xwe şewitandin. Xwe bi gorî rûmetiya mirovahiyê kirin, nehiştin ku tevgera şexsiyetê li ber tevgera bêşexsiyetê têk here.

Îro jî, dîsa li Amedê, dest bi çalakiyeke wiha hatiye kirin. Ew li girtîgehîn din, li derive û Ewrûpayê jî belav bûye. Dîl, bedenê xwe danîne rastê. Malbatênen wan hemdozîn wan, mirovîn xwedî şexsiyet, welatparêz, demokrat, bi kurtî mirov jî piştevaniya wan dîkin.

Em ji bîr nekin, ew dixwazin di şexsiyeta girtî û dîlan de, vîna (îrade) gelekî bişkînen, şikandina wan şikandina gel e, ya bîr û baweriya wan e.

## Xweşikbûna Mezrabetan

**Ji persan, hêzên Îskender, ermenîyan, rom, ereb, eceman û heta KT'ê, hemûyan dixwestin, xumexuma çemên Mezrabetan rawestînin, sererd û binerdê wê talan bikin û gel ji gelyîn berxwedanê (çiya) dûr bixin. Ji ber ku çiya; çavkaniya hebûna gelê kurd û çavkaniya mirovatiyê ne di Mezrabetan de.**

vahîyê, zanîstî û azadiyê ye.

Warê Zend-Avesta; sosyalîzma yekemîn a ku li welatê me hatiye nivîsandin e. Cara yekemîn ajotina erdê, çandina genim, kedîkirina hespan li ser vê axa zêrîn pêk hatiye. Lê tarî, xerabî, koletî, mirin bi kinahî çavkaniya xerabiyê dijmin, tu caran ji welat bi dûr neketîye.

Her dem qîrîn, di nav lepêneyaran de, mirin di bin piyêñ tirk, ereb û ecem de; xwînmijî û talankirin ji hêla dagirêner biyanî ve...

Lê gelê me bi qehremantîyeke mezin li hemberî van mîtingeran li ber xwe didin. Bi pehlewanîyeke mezin çavşoriya neyaran tefînîn, neynûkîn wan ên bixwîn hildikşînîn û agirê devê neyaran vedimrînîn.

Dijmin gelê Mezrabetan gihadibûn reşweke bêdest, bêçav, bêmêjî. Mîna kevokekê ku derbe ji serê xwe xwaribe. Nema dikare li ser piyêñ xwe ji nû ve bisekine. Lewre dîrok dipirse(ji Cegerxwîn):

"Ka Ferîdûn, ka direwşa taca keyan li ku ye? Ka Guhderz û ka Ristem, ka ew meydan li ku ye? (...) Ka Meletî, ka Xerpût, ka Çermûk û Siwêrek, kanî Ruha, ka Suruc, Mîrê Mîran li ku ye?"

Belê, iro wekî bersiva van pîsîn dîrokê, serokatî, partî û artêşê de xwe daye nişan.

Lê çawa ku neyartî bêneyar nabe, dijmin bêşer nabe, çawa ku dijmin bê-

talan û xerakirin û şewitandin, zor û zordestî nabe, bi wî awayî jî gel bê berxwedan nabe. Çawa ku berxwedan bêvîn, bêhêvî û baweri, bêzanebûn û birdozî û armanc nabe, iro jî di Mezrabetan de şerê gel ê li dijî zordariya fâşistan bêgerîla nabe. Ji ber ku,

"... Li Kurdistanê gerîla mîfte ye ji vekirina deriyê çanda şoresherî em bigirin, heyâ gerandina karê civakan yanê heyâ jîndarkirina qedera xwe, di her seviyeyê pêşketin e. Gerîla ramankarek e, rîexistinkarek e.

Gerîla leşkerek e. Gerîla di nava gel de serokek e. Gerîla welatparêzî ye, gerîla afrînerê çandê ye. Yanê pêşengete bersiv dide pêşketina gel ya bi her awayî.


Belê gerîla li Cûdî, Engîzek, Agîrî, Nûrheq û Sîpan bûye, hêviya gelan, bâweriya karkeran û xelasiya mirovahiyê ye. Weki ku tê zanîn cihê sîr û pilingen serê çiya ye. Cihê teyren baz û qulin-gan lat û zinarêne bilind e, wisa jî cihê xort û keçen bişref û birûmet, çiyayen welat qîrîn û bang dîkin ji hemû kesen ku ji deşt û newalan; ji gund û bajarêne welat bi dûr ketine; ji zarokên Kawayê hesinkar û Ristemê Zal re dibêjin: Werin me ji bin dest û lepêneyaran rizgar bikin."

Di vê bîhara rengîn de çavêne hemû çiyayen welat li benda xort û keçen pehlewan in.

**AHMET HÜSEYİN**

**KONFERANS** 4'an a neteweyî ya PKK'ê çêbû. Kovara Serxwebûnê da zanîn ku, di navbera 1-15'ê meha gulanê de Konferansa 4'an Neteweyî ya PKK'ê çêbûye.

Hate gotin ku konferansê bi rapora politika ya Serokê Giştî yê PKK'ê dest pê kiriye. Di vê konferansê de gelek biryaran weki; Zêdekirina hejmara şervanar, zêdekirina cerdên li ser bajaran, li Türkiye'y gurkirina şoreşê û amadekirina tîmén întixarî. Li gorf agahiyan konferansê bal kişand ser refgirtina li Rojhilata Navîn û li ser sûkasta li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan û rewşa şoreşa Başûr jî nîrxandin hatin kîrin.



**Li GORF** agahiyan hêzên dewletê roja 10'ê pûşperê ji sê aliyan ve ketin nava erdê başûrê Kurdistanê. Ajansa DEM'ê da zanîn ku hêzên tirk nikarin bi pêş kevin û 25 leşker hatine kuştin, 10 heb jî birîndar bûne.

Li aliye din Rêveberiya Ne-asayî li ser van operasyonan daxu-yaniyeke bi giştî da; hate gotin ku di operasyona Başûr de 39 heb gerîla, di nava du rojan de jî 72 gerîla û 6 leşker hatine kuştin. Li gorf pêzanînan, hêzên tirk bi 6-7 km'yi ketine nav erdê Başûr, li derdora Çiyayê Reş û Zixurê Elehê şer derketine. Li gorf nûçeyen DEM'ê zaiyatê gerîla 2 ne.

## NÛÇE

DIK

Grevê veşanîn

Z'dê rîbendan di hilbijartînê giştî bi. Badê nê hilbijartînî hikûmetê Anayol eskeran na ro û serokê Polîsano ve rîn Mehmet Ağar kerd wezîrê edeletî. Mehmet Ağar senî ki bi wezîrê edeletî, zîndanan di zîlm û şasetû fina bî zey berî. Qeydê coya mehkûmê ki zîndanan di Amedî di 4'dê avrêl di greva veşanîn (vîsanîn) aşçanîn ilan kerd. Wast Mehmet Ağar istifa bikiro; dewleta tirk qanûnî şerî di şer bikiro, veng bido agirbestê PKK'ê û mehkûman rê mûameley hesîr bikiro. Fina wast şasetûyan û zîlman zîndanan di biqedîno. Dewlet o roj ra no roj ne venê xo da ci, ne jî goşê xo da ci.


Mehkûman na fin 25'ê avrêl di greva veşanîn bêaçarnayîş dom kerd. Badê 25'ê avrêl di ca ca zîndanandê bînan di malbatanê mehkûman destek da ci. Grevê veşanînê Zîndanê Amedî di dom kerdê, dewleta tirk jopana, qelasana resê mehkûman, 19 mehkûmî kerdî dirbetinî (birîndar). Nê mehkûmê dirbetinî sirgûn kerdî Zîndandê Dîlûkî (Enteb).

Ew ro greva veşanîn nezdîyê 50 rojyo û dom keno. Jew zîndanan di nê tevera jî dom keno. Tevera açarnayîş, zîndanan se bêaçarnayîş ûwo dom keno. Rewşê mehkûman qe rînd niyo, pêro biye neweşî. Mehkûmî ew ro gunî verejenî, serey cino geyreno.

Tevera miletê zaf destek danê mehkûman. Caw ki greva veşanîn dom keno, ca cîniyo kes xo bilûnê. Ew ro Tirkîye û Kurdistan di hemû zîndanan di greva veşanîn dom keno. Tevera se Stenbol; Ümraniye, Bahçelievler, Şişli, Gebze (İzmit), Edene, Dîlûk, Mîrsin, İzmîr, Manîsa di avahîyena HADEP di dom keno. Amed jî avahîya RP di dom keno; Çanakkale di avahîya ÖDP di greva veşanîn esto. Ewrûpa di 9 ca û kampta Et-rûşê di jî kurmancyanê ma destek danê hesîranê şera. Qandê joya ïnan jî greva veşanîn ilan kerd.

MEMED DIREWŞ

# Rayedarên dewletê, dîsa sê meymûnan dilîzin



**E**m ci bibêjin, ci nebêjin? Ma gelo tişte ku were gotin ma êdfî? Tişten ku nehatine nivîsandin man?

Ev nêzîkî sê meh e ku li girtîgehan, girtî ji bo jîyanêke baş, serê xwe li ber mirinê danîne û daxwaza wan ew e ku bi fedakirina canê xwe kesenî li dû wan xwedî jîyanêke baş bin. Lî dewlet wekî her carî mîna sê meymûnan: Nabîne, nabihîze û tiştek jî nizane!

Tê zanîn ku di dîrokê de mînakên bi vî rengî gelek in. Lî kesenî li ber xwe didin riya mirovatiyê vedikin, kesenî li hemberî wan jî tê lanetkirin.

Ci mirovîn ku li hemberî sîstemêni li dijî insanetiyyê dengê xwe hilanîne, hatiye xwestin ku ew deng were birîn, lî dîrok jî şahid e ku ev yek ne mimkun e û ci astengê ku derkevin pêşîya insanetiyyê jî her tim derbeyeke mezin xwarine û di sergoya dîrokê de riziyane. Çunkî tu hêz nikare li ber riya mirovatiyê bibe asteng.

Her çiqas iro cografaya lanetkirî ku em li ser dijîn hê nebûbe warê insanetiyyê jî, bi berxwedana şervanê azadiyê, dawîya hoveberiyê her tê xuyan. Tişte herî muhîm ew e ku divê her deng bigihîjin hev, da ku ew deng guhîn kesenî ku nabihîzin,

ker bikin. Tabî rayedarên dewletê jî li ber xwe didin, nexwe dizanîn, ku wisa nebe wê mayîna wan jî ne mimkun be.

Baş tê zanîn ku li welatê demokrat, kîrinê hoveber ên bi vî rengî dîbin sebeb ku rayedarên dewletê an jî kesenî ji bûyerê mesûl istîfa bikin û êdî ew tiş di sicîla wan kesan de cih digire, heta mirinê. Lî belê, li vê cografayê jî her kesî re eyan e ku kî, ci kes e, lî dîsa jî kesenî şerxwaz û xwînrij li ser kar in û heta wezîfeyen wisa digirin ser xwe ku, dikarin kirinê xwe yê hovane zêdetir bikin.

Livebaziya iro ku li çarmedora Tirkîye û Kurdistanê diqewime, ne carek e, ne du car e, ne sê car... Lî belê her berxwedan riya mirovatiyê bêhtir ronî dike, insan tê digihîjin ku êdî "Berxwedan jiyan e!" Ji girtîgehan Berxwedana Mazlum Doğan, Berxwedana Çaran, Berxwedana 14'ê Tirmeha 1982'yan ji bîra tu kesî neçûne hê jî. Hayrî, Kemal, Akîf û Alî mîna iro ew jî bi rojiya mirinê, li ber çavên dînyâye bi berxwedana xwe gîhîştin şehadetê. Ewê her tim di riya mirovatiyê de bibin çira, kesenî rayedar jî bûn lanetkirî.

Greva 19 girtî yênu ku ji Girtîgeha Amedî sirgûnî Girtîgeha Dîlûkê bûbûn, ji 25'ê avrêl û bi vir ve didome û ew li ber miri-

Çi mirovîn ku li hemberî sîstemêni li dijî insanetiyyê dengê xwe hilanîne, hatiye xwestin ku ew deng were birîn, lî dîrok jî şahid e ku ev yek ne mimkun e û ci astengê ku derkevin pêşîya insanetiyyê jî her tim derbeyeke mezin xwarine û di sergoya dîrokê de riziyane. Çunkî tu hêz nikare li ber riya mirovatiyê bibe asteng.

nê ne. Dibêjin ku, "Mîrin ne xem e ji bo me, ji bo jîyanêke birûmet."

Her wiha girtiyen Girtîgeha Amedê, Stenbolê, Ruhayê, Enqereyê, Bursayê, Mîrsinê, Semsûrê, Mîrdînê, Gebzeyê, Konyayê, Meraşê, Sîrtê, Batmanê, Sêwazê, Meletê, Erziromê... yanê yêncarmedora Tirkîye û Kurdistanê, ji bo ku zor û tehdîyêni li ser wan werin rakirin û di pîvana insanetiyyê de werin darizandin, li ber xwe didin û ev berxwedana wan jî pêl bi pêl belav dibe û xwe digihîne her derê dînyâye.

Ji girtiyen bi darê zorê ev tê xwestin: "An hûnê dev ji nasnameya xwe ya siyasi berdin, an jî hûnê bimîrin!" Girtî jî wekî her carî disa bersivê didin: "Berxwedan jiyan e!"

Ma tenê girtiyen girtîgehan?

Malbata girtiyen jî li derveyî girtîgehan, li bajarêne Tirkîye û Kurdistan û li bajarêne Ewrûpayê ji bo piştgiriya wan, ji bo piştgiriya zarokêne xwe di eynî berxwedanê de ne.

Wê ev berxwedan wisa fireh bibe û dengê wan jî wisa bilintir bibe ku, wê guhîn kesenî ku nabihîzin ker bibin û her wiha lal bibin.

AYNUR BOZKURT

# Habitata polisan

zora ya  
NY'ê bir

**C**ivîna Neteweyen Yekbûyi ya bicihkirina mirovan HABITAT'ê heftiya çûyi bi şe-weyeke nû dom kir. Roja 7'ê pûşperê polisan tirk dest avêt karê HABITAT'ê û bi sedan mirov li qere-qolên cur bi cur bi cih kirin. Bi vî awayî jî dan pejirandin ku ew ne tenê di karê jicikhkirina gundiyen Kurdistanê de her wiha di karê "bicihkirina mirovan" de jî xwedî huner in.

Roja 7'ê mehê Serokê İHD'ya Stenbolê Ercan Kanar û Serokê Komeleya Hiqûqvanen Nûjen (ÇHD) Mustafa Üçdere li ber Postexaneya Sirkeciyê bi koteke hatin girtin. Wan dixwest birûskeyekê ji Wezîrê Karê Dadê Mehmet Ağar re bişînîn û bi vî yekê jî piştevaniya girtiyen di greva birçibûnê de bîkin. Heman rojê li Qada Taksimê hin mirov û li ber deriyê Girtîgeha Bayrampaşayê hinek sendikavanen weki Serokê Hava-İş'a Stenbolê Atilla Ayçin, Serokê Genel-İş'a Stenbolê Erol Ekinci, Cîgirê Serokê KESK'ê Faysal Özçift û Serokê Deri-İş'a Stenbolê Munzur Pekgûleç hatin girtin.

## Taksim hate dagirkirin

Roja 8'ê pûşperê ji ber ku rayedarên Konfederasyona Karmandan KESK'ê da zanîn ku ewê xwepêşandan li dar bixin, derdora Qada Taksimê ji aliyê hêzen dewletê ve hate dagirkirin û ketin û derketina herêmê hate astengkirin. Di gel vî yekê riya otobanê hate bîrin û gelek karmendan ku ji derveyî Stenbolê hatin binçavkirin.

Polisan, saet di 12'an de pêşî berê xwe dan malbatê windabûyan û nehiştin ku ew danişina xwe ya kevneşopî ya 53'yan çebikin. Pişti nîqaşeka kin, polisan êris bir ser malbatan û gelek mirov hatin binçavkirin. Di dawîya êrisê de hin kesen weki xwişka Metin Göktepe Meryem Göktepe, jina Talat Türkoğlu Hesena Türkoğlu, hinek parêzêren İHD'ê û besdarê HABITAT'ê hatin birîndarkirin. Ji serê sibê ve ketin û derketin ji hinek saziyên weki ÖDP, KESK, NÇM û İHD'ê hatibû qedexekirin. Gelek kesen ku hatin van cihan, ji aliyen polisan ve hatin girtin. Ji van yek Serokê SIP'ê Aydemir Güler bû ku li ber deriyê KESK'ê hate girtin. Her wiha Cîgirê ÖDP'ê Erdal Kara, Cîgirê Serokê HADEP'ê Bahattin Günel, Serokê KESK'ê Siyami Erdem jî pişti nîvro hatin girtin. Di saet 2'yan de hinek karmandan xwestin bimeşin, lê polisan bi jopan êris birin ser wan û gelek kes girtin binçav.



**Bi sedan besdarê HABITAT'ê yên sivil, piştgiriya xwe ji bo tevgera dayikan û karmandan diyar kirin, lê rayedarê dewletan û rayedarê NY'ê dîsa li hemberî kirinên dewletê bêdeng man. Hin kesen ku bi çavê xwe kirinên hêzen dewletê dîtibûn çavdêriyên xwe anîn zimên.**

## Eleqeya taybet ji bo NÇM'ê

Divê bê gotin ku hêzen dewletê bi tenê li kesen ku dixwestin doza mafêن xwe bikin nedan, her wisa jî weki rojnamegeran jî ji wan lêdan xwar. Rojnamevanê Milliyetê Musa Ağacık û nûçegihanê Yeni Yüzyılê Ahmet Şık, Serokê CGD'ya Stenbolê Murat İnceoğlu di serî de, gelek rojnameger bûn hedefê êrisa polisan.

Polisan di vê navê de eleqeyeke taybet nîşanî Navenda Çanda Mezopotam-yayê (NÇM) dan. Her du şaxen NÇM'ê (Beyoğlu û Tarlabası) jî heta serê sibeha yekşemiyê di bin gemaroya hêzen dewletê de man. Gelek xebatkarên vê saziyên hatin binçavkirin. Li hemberî NÇM'ê HABITAT'a polisan roja duşemiyê jî dom kir, vê rojê jî hin xebatkarên NÇM'ê hatin girtin.

Sedema vê eleqeya taybet geşta kevneşopî ya vê saziyê bû. Bi vê gemaroyê rî li ber geşte girtin û nehiştin geşt çêbe. Lî rayedarê NÇM'ê didin zanîn ku ew li hemberî van kirinan serî nate-wînin û wê di rojê pêş de geşta xwe

bikin. Hate gotin ku ji bo geşte amade-kariyeke mezin çêbûye û dihat hêvîkirin ku li dora deh hezarî mirov besdarî geşte bibin.

## Reaksiyona rêxistinên demokratik

HABITAT'a polisan bû sedema reaksiyona gelek saziyên demokratik. Roja 10'ê pûşperê Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras li navenda partiya xwe civîneke çapemeniyê li dar xist. Di vê civînê de Ufuk Uras helwesta hêzen dewletê şermezar kir û got: "Cîgirê Serokê Emniyetê Kemal Yazıcıoğlu, Wezîrê Karê Hundîrîn Ülkü Güney û Wezîrê Dadê Mehmet Ağar di valahiya siyasi de derbeya polisan çebikin." Li gorî gotina Uras cîgirê serok, car rîveberên partiyê û 40 rîveberên navçeyan jî di nav de 250 endamên wan hatine girtin.

Heman rojê Komiteya Rêveber a KESK'ê civîneke çapemeniyê li dar xist û kirina hêzen dewletê protesto kir. Serokê KESK'ê Siyami Erdem da zanîn ku Serokê Polisan ê Stenbolê, Waliyê Stenbolê û Wezîrê Karê Hundî-

rîn ê Tirkîyeyê weki mîlîtanên rêxistinê tundraw ên rastgir tevdigerin. Erdem, nêzîktêdayîna polisan a li hemberî livbaziyên rêxistinê demokratik bi helwesta wan a li hemberî protestoyen hêzen nîjadperest re da ber hev û dupi-vaniya hêzen dewletê li ber çavan raxist. Serokê KESK'ê da zanîn ku di van qewmînan de 250 endamên konfederasyona wan hatine girtin.

## Mêvanan jî debar nekir

HABITAT'a polisan herî zehf endamên rêxistinê sivil (NGO) ên ku ji bo HABITAT'ê hatibûn, metel hiştin. Lewre jî bi sedan endamên rêxistinê sivil rojê 9 û 10'ê pûşperê li ber cihê ku civînê wan çedîbûn (Kampûsa Taşkışlayê ya İTÜ'yê), xwepêşdân protestoyî li dar xistin. Wan devê xwe bi paçekî reş girtin û xwe li erdê dirêj kirin. Bi vî awayî jî dan fêmkirin ku ew kirinên polisan napejîrinin.

Pişt re jî berdevkê wan daxuyaniyek xwend ku tê de kirinên roja şemîyê dihat şermezarkirin. Di vê daxuyaniyê de nûnerên rêxistinê sivil dixwestin ku polis hemû kesen ku hatine binçavkirin berdin. Wan digotin ku heta ew neyên berdan, ewê her roj vê protestoyê li dar bixin. Ew li ser gotinê xwe jî sekînîn û roja din protestoya xwe domandin.

Bi sedan besdarê HABITAT'ê yên sivil piştgiriya xwe ji bo tevgera dayikan û karmandan diyar kirin, lê rayedarê dewletan û rayedarê NY'ê dîsa li hemberî kirinên dewletê bêdeng man. Hin kesen ku bi çavê xwe kirinên hêzen dewletê dîtibûn çavdêriyên xwe anîn zimên. Beşdarekî norweci diyar kir ew bi xwe du saetan di binçav de maye. Wan xwestin ku polis li şûna kirinên bi vî rengî, herin hevalên xwe yên ku 400 kes di binçav de winda kirine, bigirin.

Protestoya wan gelekî bal kişandû çapemeniya tirk a ku dixwest raya giştî çewt agahdar bike, neçar ma ku hinek rastiyen eşkere bike. Hin rojnameyên weki Hürriyetê pişti van protestoyan gotin: "Em rezil bûn." Her wiha ji çapemeniya biyan bi berfirehî cih da bûyeran û kirinên dewletê ragihandin raya giştî ya cîhanê. Lî Wezîrê Karê Hundîrîn helwesta xwe şayanî dewleta tirk nîşan da û idia kir ku ji kesen girti 156 endamên rêxistinê weki PKK, DHKP-C, MLKP, TDKP'ê ne, lê tevi vê idiayê jî hemû kesen di bin çav de hatin berdan.

SAMÎ BERBANG

# Ku penaber kurd bin!

**Kurdên ji rojhilata Kurdistanê (Iran) ku 90 kes in, di van rojan de mafê wan ê mayînê li Tirkîyeyê diqede. Ji ber ku dewleta tirk bi Iranê peyman mor kiriye, ew dixwaze wan bide Iranê û beramberî wan ji Iranê gerîlayen PKK'ê bistîne.**

**B**erî sê salan ji ber ku li hemberî rejîma Iranê derketibûn, dewleta Iranê cezayê mirinê dabû hin mirovan, hejmara wan tevî zar û zêçan digihîst 90 kesî. Ew jî bi penaberî hatin Tirkîyeyê. Dewleta tirk di bin nezareta Komîseriya Bilinda Penaberan a Neteweyen Yekbûyî de, destûra bi dirêjiya 3 salan li Tirkîyeyê mayînê dabû wan. Di van rojan de mafê wan ê mayînê li Tirkîyeyê diqede. Ji ber ku dewleta tirk bi Iranê peyman mor kiriye, ew dixwaze wan bide Iranê û beramberî wan ji Iranê gerîlayen PKK'ê bistîne.

Sala çûyî dîsa di 4'ê gelawêjê de li Navenda BSP'ê (Partiya Yekbûyî ya Sosyalist, ku niha nîn e) dest bi greva rûniştinê kiribûn. Ev 3 sal in ku Tirkîyeyê penaberîya wan qebûl nekiriye û nahêle ku "Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyen Yekbûyî (UNHCR)" jî mafê penaberîye bide wan. Roja 4'ê pûşperê li Enqereyê bi daxuyaniye çapemeniyê wan dest bi

greva birçibûnê ya bêmuhlet kirin. Hînek ji wan ji hatibûn Stenbolê ku ji saziyên demokratik û aştixwaz piştgiriyê bistînin û li navenda Partiya Aşî Demokrasiyê (DBP) dest bi greva birçibûnê kiribûn. Piştî roja 8'ê pûşperê li navenda DBP'ê li ser navê wan DBP, HADEV, ÖDP, EP, IP'ê, di 8'ê pûşpe-

yê bi nav kirin. Wan got:

"Heke tiştek bê serê wan insanan bersûcê wê Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyen Yekbûyî û rayedâren dewleta tirk in."

Di dema daxuyaniyê de polîsên tirk DBP hildabûn bin ablûqayê.

Penaberîn ku hatibûne Stenbolê ji


zarok û 20 ji jinan pêk tê, li ÖDP, DBP û İHD'ê di greva birçibûnê de ne. Li gorî agahiyê ku ketine destê me rewşa tenduristiya 7 jînê di grevê de, ne baş e. Li Stenbolê jî li navenda DBP'ya Aksarayê, li navçeya Avcilar û Maltepeyê ji bo piştgiriyâ wan hin kesan dest bi grevê birçibûnê kirine.

Her wiha li bajarê Almanya li Hamburgê jî endamên Komîteya Parastina Penaberîn Iranî bi mebesta piştgiriyê dest bi greva birçibûnê kirine. Dîsa partî û saziyên demokratik ji bo ku pirşirêka wan bê çareserkirin xebat û calakîyan dikin. Penaberîn ku li Enqereyê diyar kirin ku dewleta tirk hevalekî wan i bi navê Kasim dane Iranê û her wiha hevalekî wan jî ku navê wî Aram e vê gavê li Enqereyê di binçav de ye. Tirsa wan ew e ku dewleta tirk wan yek bi yek bigire û radestî Iranê bike.

Berjwendiyên siyasi yên kirêt dibe ku bibe sebebê radestkirina penaberîn kurd ên rojhila. Dewleta tirk serîlêdana wan a penabertiyê, ji ber ku ew kurd in nafejirine, bi vê yekê jî xalê Peymana Cenewreyê binpê dike.

Li hêla din ew, kesen ji Afganistan, Çeçenistan, Bulgaristan û Asya Navîn wekî penaber qebûl dike. Digel vê Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyen Yekbûyî jî wan kesan wekî penaber nabîne ji ber ku li Iranê vê gavê şer tune. Li gorî idaya wê tu mafê mirovan ên siyasi û bingehîn li Iranê nehatîne qedexekirin.

METİN AGIRİ




rê de daxuyaniyek dane çapemeniyê û dan zanîn ku dewleta tirk di sala 1951'î de Peymana Cenewryê ya Mafê Mirovan qebûl kiriye, lê Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyen Yekbûyî wan mirovan wekî penaber nabîne û dixwazin wan bidin Iranê. Nûneren partîyan ev yek wekî súcekî mirovahî-

piştî daxuyaniyê ji ber ku casusen Iranê li pey wan bûne û bi tirsa ku wê wan bikujin li Stenbolê nesekinîn çûn Enqereyê. Li hêla din dewleta tirk xwestiye ku wan ji hev biqetîne; du heb sê heb bişîne bajarê Kurdistanê û bi awayekîne – resmî iadeyi Iranê bike.

Li Enqereyê jî 90 kes, ku ji wan 39

## Zanîngeha Kurdistanê; medrese (5)

CELALETTİN YÖYLER



**B**andora medreseyê ya neyînî (negatif) li ser gelê kurd bi mêtîngîriya olê û paşverûtiyê ye. Medreseyen Kurdistanê çawa ku birek seydayen gelperwer û welat-parêz muntehî kirine, wisa jî bi hezaran kesen paşverû û mêtîngîren olê derxistine. Bi rastî jî çi dema ku em li rewşa mêtîngîriya olî ya di Kurdistanê de dînihîrin em dibînin, ku mêtîngîriya pir bi gemar ji aliyê mele û şêxen paşverû yê Kurdistanê ve hatiye kirin û tê kirin. Ew gemarîn mêtîngîriya bi sedan sal in ku bûne sedemîn sergêjiya gelê bindest û belengaz, nahêlin ku ew çavên xwe vekin û li cîhanê hemdem bimeyzînin û xwe nas bikin.

Ew bêwicdanên paşverû bi navê ol, bi hezar tiştine ku bi Quran û gotinê pêxem-beran re ji binî dijber in, xistine nava gelê kurd ê reben û belengaz, û bi wan xurafeyen xwe, çavên gel kor kirine; guhêwan ker kirine, ziman û devêwan girtine û xitimandine, nehiştine ku gelê bindest cîhanê bibîne, rastiyê seh bike û qenciyê bibêje.

Belê ev tevgera han a çepel her bi tenê di nav gelê bindest û perçiqandî de tê dîtin.

Mêtîngîr û sitemkar û dagirker, heval û hogîrên hev in, ji bo berjwendiyê xwe yên kesane, her tim li cem hev in; gelê bindest bi hev re dizêrin û di nav de bi pelidî (şeytanî) didine cirîdan û meydanan.

Belê ev hem belaya serê gelê kurd in, hem jî gel ji ola wan, ji heyîn û nirxên wan ên mirovahî û gelêri û neteweyî didine dûrxistinê, serê wan didine avdanê. Ew bi qirêjî û gemariya paşverûtiya bi navê ola İslâmî, lê bi rastî û zanyarî ew tiştîn ku ew hînî gel dikin, ne ol e ne jî mirovahî ye; ne jî zanyariya hemdemî ye. Ew her xapandin e, mêtîngîr û hevalbendiya dagirkeriyê û xwîmijîyê ye.

Ola İslâmî ne wekî tevgera wan a bigemar e. Ol hişyarî û pêşveçûyîn û xwenasîn e. Ne pûtperestiya paşverûyan, ne jî vir û derewên wan in. Ew vir û derewên ku gelê bindest bi wan didine razandinê di xewa koletiyê de, ji bo ku ew gel ji wê xewê hişyar nebin û her tim ji wan û hevalbendêwan ên dagirker re nêçîr û xwarin bin, tê kirin.

Em werin ser gemariya ewen ku ji medreseyen Kurdistanê derketine, lê olê di xapandin û mêtîngîriya gelan de dixebeitînin, ka gelo ew cih didin gel. Belê emê hinekî ji mînakîn kirinê wan çepelan derxînin holê û binirxînin. Ew paşverû her tim di gotin û wazîn xwe de, bi hezaran Xwedayan diafirînin. Ji gel re dibêjin her tim şêx bînîn ber çavên xwe, lê ol wisa nabêje. Ol dibêje: (îyyake neebudu, we îyyake nesteînû) em hey ji te re perestiyê dikin û hey ji te

alîkariyê dixwazin. Lê paşverûyên mêtîngîr jî, ji gel re dibêjin: Hûn şêx ji bîr nekin. Gelo şêx ci dike di welatê gelê bindest de, ew jî ziaretan diafirîne, berê gel ji çêkerê wî yê pir mezin dizivirîne, dide ziaretgeha Histûna spî ku ew jî li binê banê xanî yê tendûra şêx e. Hem jî berê gel dide Hêjira bipoçik, ku ew jî zarêñ lawîn dide pîrek û dayikêñ kurdan, an jî berê gelê bindest dide bal baweriya Firandina şêx an jî şêx xenîmî mirovan dibe, mirovan kor dike û di hingive. Bi hezaran mînakîn wekî van.

Ê ji xwe dema ku mele van kirinê nelirê bi çavê xwe di welatê me de dibîne û xwe jê re ker dike, û nabêje ev rewşa han hevpariya ji Xwedê re ye, wê demê ew mela bi vî awayî paşverû nîn in lê ci ne? Bi kurtî ez dikarim bibêjim di nav gelê bindest ên ku welatêwan hatiye dagirkirinê mêtîngîriya olî her heye.

Hem jî yên ku bi sedan salan gelê kurd bêmejî hiştine her ew alîkarê dagirkeran, paşverûyên Kurdistanê ne. Ew afyon in, xirebeng in, araq in ji bo gelê bindest û belengaz. Ew paşverû bi van gotinê xwe yên pelidî, hem jî bi navê ola İslâmî gelan serxweş dikin, lê ew gotinê wan ne olî ne, her gemarî û mêtîngîriya olî ne.

Dema ku em nirxandina li ser rewşa paşverûtiya mele û şêxan dertînine navendê, em bi taybetî qala paşverûyên mêtîngîr dikin.

Lê ew mela û şêxen xwenas û Xwedanas, ew li cem min birêz rûmet in; heval û hogîrên bindest û belengazan in.

# Ji raya giştî re

**Divê girtî di bin ewletiya hiqûqê de bin. Lewre em sersariya  
li hemberî girtyen li ber mirinê û êrişen li ser wan şermezar dikan.  
Guhnedana dengê girtyen li ber mirinê cinayet e!  
Hemû kesen ku demokrasiyê dixwazin  
divê li dijî vê rewşê derkevin !  
Ev berpirsiyeke însanî ye! Bêdengî şirîkatiya sûc e!**

Ahmet Kaya (Stranbêj), Gültén Kaya, Tahir Eldemir (Rojnamevan), Şirin Eldemir, Fuat Karnaz, Halil İbrahim Özcan (Şair–Nivîskar), Halil Dede, Doğan Güzel (Karîkatûrist), Eşber Yağmurdereli (Parêzer), Yusuf Çetin, Nebile Irmak, İsmet Kargılı, Cem İslyapan, Faik Özgenç, Demir Keskin, Necmettin Çobanoğlu (Serokê Sine–Sen’ê), Aynur Bozkurt (Rojnamevan), Rahmi Batur (Rojnamevan), Mehmet Gemsiz (Rojnamevan), Sultan Gemsiz Sami Tan (Rojnamevan), Selma Tan, Leyla Cemri, Metin Aksoy (Rojnamevan), Murat İnceoğlu (Serokê ÇGD’ya Stenbolê), Ahmet Şik (Rojnamevan), Süheyla Akbulut (Rojnamevan), Sibel Kayacı (Rojnamevan), Eylem Dinyal (Rojnamevan), İrfan Uçar (Rojnamevan), Yusuf Sahici (Rojnamevan), Sadık Çelik (Rojnamevan), Aslan Yıldız (Rojnamevan), Zekine Türkeri (Wergêr), Nuray Şen (Seroka NÇM’ê), Süleyman Gültekin (Muzîsyen), Hasan Kaya (Birêvebirê NÇM’ê), Serhat Karakaş (Muzîsyen), Kazım Öz (Karker), Hüseyin Balıkaya (Mamosteyê Folklorê), Erdal Ceviz (Şanoger), Saniye Tunç (Şanoger), Yıldız Gültekin (Şanoger), Hüseyin Umaysız (Şanoger), Hüseyin İldan (Muzîsyen), Bahatin Özen (Karker), Mahmut Doğan, Esma Eksen (Weşankar), Murat Batğı (Şanoger), Nihat Öz (Endezyarê Xerîteyê), Aysel Aydemir (Şanoger), Nebehat Akkoç (Perwerdekar), Nail Yurtsever (Muzîsyen), Şener Yıldız (Muzîsyen), Serap Mutlu (Perwerdekar), Ender Öndeş, Serap Öztop (Muzîsyen), Leyla Civak (Muzîsyen), Yekbûn Civak (Muzîsyen), Zahir Kayan (Şair), Hasan Öcalan (Muzîsyen) Zeynel Abidin Çakır, Mendoşa Biçerman, Nurhayat İslyapan (Ebûqat), Nazike Aydos, Aydin Biçerman, Muhyettin Çakır, Kudret Çakır, Mehmet Aslan, Kamile Aslan, Şeref Aksu, Melhat Aksu, Şuayıp Türün, Halil Zümрут, Kemal Ulusoy, Medeni Uğurel, Evin Tavacı, Aydın Direk, Cengiz İnce (Hunermendê Folklorê), Feride Çiplak (Hunermenda Folklorê), Gülcân İşçi (Hunermenda Folklorê), Saadet Irmak, (Muzîsyen), Erhan Yıldırım (Şanoger), Zeynep Yaş (Xwendevan) Baran Gündogdu (Şanoger), Oya Selim (Sekreter), Vehbiye Tüzün, Kemal Ogun (Şanoger), Turhan Yapıştıran (Muzîsyen), Nazmî Kırık (Hunermendê Folklorê), Şêxo Kısa (Şanoger) Salman Şenses (Muzîsyen), Kadriye Şenses (Muzîsyen), Ali Geçimli (Muzîsyen) Aşkın Haskaya (Hunermendê Folklorê), Aynur Bayer (Hunermenda Folklorê), Azize Bayer (Hunermenda Folklorê), Resul Ülker (Hunermendê Folklorê), Cemal İnce (Hunermendê Folklorê), Nuray Balık (Hunermendê Folklorê), Esen Deniz Engin (Hunermendê Folklorê), Süleyman Baran (Hunermendê folklorê), Nesrin Akban (Hunermenda Folklorê), İbrahim Çiplak (Hunermendê Folklorê), Salih Dilek, Ağa Karacak, Hüseyin Ayrılmaz, Selman Yeşilgöz, Mehmet Sel, Elif Uçur, Mehmet Kayan, Hakan Aslan, Levent Çelik, Nevin Yakup, N. Akkoç, Nazmi Gür, Olcal Meral, Songül Diribaş, Ergün Yetkiner, Vedat Çetiner, Şener Altınsoy, Özcan İpek, Yalçın Çakmak, Neriman Çakmak, Nurgüll Sila, Albert Gulder, Auiua Marki, Fin Santos (Filîpîn), Jocelyen Masqueda (Filîpîn), Gatia Valler (Filîpîn), Ka Puqe Barromed (Filîpîn), Ka Lyndia (Filîpîn), Jan Stromdahl (Stockholm Swêd), Per Lager Riksdagen (Green Party), Zeliha Dağlı (Endama Meclîsa Belediya Stockholm), Ali Akkuş (Dirôkzan), Mahmut Şakar (Parêzer), Gatlerine Kelly (U.K), Fadime Genç (Perwerdekar), Turan Taş (Weşankar), Songül Köse (Rojnamevan), Helîn Kubilay (Şanoger), Seyitxan Unay (Şanoger), Vedat Kuşku (Şanoger), Hatice Çoban (Şanoger), Sevda Can (Şanoger), Yusuf Unay (Şanoger), Dilber Taşçı (Şanoger), Şiyar Uğurlu (Şanoger), Bêrîvan Karaman (Şanoger), Gafur Doğan (Şanoger), İşıl Özmuş (Şanoger), Bülent Turan (Muzîsyen), Gülcân Kurnaz (Muzîsyen), Çiğdem Karaman (Muzîsyen), Sevinç Karaman (Muzîsyen), H. Malzum Karaman (Muzîsyen), Mürsel Yavuz (Muzîsyen), Birkan Kaygısız (Muzîsyen), Hasan Kaygısız (Muzîsyen), Ozan Xanemîr, Ozan Ganî Nar, Mustafa Sayın (Muzîsyen), Berivan Uğurlu (Şair) Emirali Genç (Resam), Aziz Doğan (Weşankar), Mehmet (Resam) Cengiz Kırık (Rojnamevan), Yasemin Melek, Cemil Aydoğan (Rojnamevan), Hayrettin Yılmaz, Süleyman Sönük, Yusuf Kılıç, Resul Memiş, Gül Neusham, Esen Karaman, Habibe Çiftçi, Hamide Yüksel (Şanoger), Nedim Özgün, Feride Aslan, Hasan Çağan, Gülşen Aydin, Leyla Saraç, Selal Saraç, Serdar Adîbelli, Mazlum Adîbelli, Sinan Çalışkan, Adnan Bingöl, Gültén Kılınç, Resul Çelik, Lale Küçükaydin (Şanoger) Nurten Çelebi (Hunermenda Folklorê), Bahar Çakal, Fehime Tunç, Menife Çelik, Hakmiye Tunç, Felek Çelebi, Şekernaz Çakal, Allattin Gümüş, Nesim Kasırgo, Şengül Pak, Ramazan Tunç, Hediye Tunç, Nurten Çelebi, Ramazan Korban, Rahime Korban, Gökçe Selim, M. Hüseyin İnan, Zülfîye Dolu, Ekrem İlhan, Meşruk Çiftçi, Şahin Ölmez, Kadir Öztunç, Hasan Yankaya, Cengiz Yeşilyurt, Levent Önder, Canan Can, İşıl Özmuş, Ali Doğan, Bircan Akyol, Metin Salman, Elif Koç, Hasan Karaca, Murat Baydemir, Sevgi Aslan, Hamdusena Acar, Halit Şahin, Resul Saraç, Resul Memiş, Şirin Kaya, Zeynep Kaya, Yusuf Kaya, Gurbet Kaya, Tülay Beşli, Feride Aslan, Fevzi Taşdemir, İzzet Gültekin, Eşref Murat, Cengiz Demir, Mahmut Taşçı, Abdullah Akıl, Zelal Boğa, Beşir Ant, Selahattin Bozkurt, Mehmet Tanboğa, Kadircan Özer, Nizamettin Yalçın, Yasemin İpek, Delal Yıldız, Sevgi Kamer, Erhan Kaya, Nihan Turan, Hakkı Kaya, Nihan Turan, Hakkı Başer, Mürçet Başer, Nilgün Özhan, Savaş Deniz, İlknur Cömert, Şivan Uzunoğlu, Özgen Bulut, Cevahir Yüksel, Ahmet Kaymak, Mehmet Doğan, Ahmet Atbirer, Nuri Baykal, Selim Okçuoğlu (Parêzer), Salih Beşaltı (Parêzer), Niyazi Çem (Parêzer), A. Vahit Kaya (Parêzer), Naciya Kaplan (Parêzer), Aysel Tuğluk (Parêzer), İsmet Ateş (Parêzer), Edip Yıldız (Parêzer), Sedat Sadioğlu (Parêzer), Filiz Köstak (Parêzer), Muzafer Ünlü (Serokê Genel İş’ê), Ramazan Ülek (Endamê HADEP’ê), Muharrem Söylemez (Ekonomist), Zarife Söylemez, Halil Yeşilmen, Cem Yılmaz (Derhêner), Rahmi Demir, Ali Canboğa, Orhan Babir, Cebbar Doğan, İkramettin Altaş, Cüneyt Bahadır, Barış Ayyıldız, Hanifi Çiçek, Ferîç Akbaş, Mustafa Yücedağ, Murat Aydoğan, Mehmet Tarak, Sezer Özcan, Mustafa Kaya (Xwendevan) Yusuf Asker, Showen Stensil, Lucy Shorratt, Aynur Güvenç, Barış Okutucu, Sultan Güvenç, Ercan Demir (Karmend), Cafer Demir (Karmend), Mehmet Alcay (Karker) Yavuz Longurlar (Karker), Osman Turan (Çermvan), Ali Gürsel (Bazirgan), Muhlis Asan (Aktör), Rukiye Okumuş, M.Nuri Hoca (Mamoste), Muhittin Kaya (Karmend), Selahattin Acar, Görgün Can, Genco Aslan, Güler Kasırga, İsmail Aslan, Gülsen Burak, Yüksel Budak, Mahsun Adigüzel, Zühre Çakmak, Mesut Doğanay, Situ Engin, Junda Kaya, Neval Acar, Ahmet Kaya, Ramazan Turan, Murat Güldemir, Kemal Güney, Yusuf Metin, Cem Aslan, Zeynep Aşar, Cumali Sosyal, Mustafa Komrhan, İbrahim Erbaş, Uğur Balık.



Hemzeyê Muksî

● 20.06.1918: Kovara Jîn li Stenbolê dest bi weşanê kiriye. Ev kovar bi piştgiriya Komeleya Pêşketina Kurdistanê hatiye weşandin, berpirs û xwediye kovarê Hemzeyê Muksîbû. Kovar bi her çar zaravayen kurdu weşan kiriye û 25 hejmar hatiye weşandin. Kovar ji aliyê kadroya niviskaran pir xurt bû. Ji her deverê Kurdistanê niviskar hebûn, wekî: Pîremêrd, Tewfîq Silêmanî, Xelî Xeyâli, Kemal Fewzî, Evdîrahîm Rahmiyê Hekarî, Memdûh Selîm Beg, İhsan Nuri Paşa, Kemal Elî Bedirxan û pir kesen din ên navdar.

Dî destpêka weşana kovarê de sernivîsek hatiye weşandin, di wê nivîse de tê diyar kirin ku kovar ne bi armanca pere qezenzkirinê tê çapkirin. Armanca derketina wê wekî hêvotina gelê kurd li ser çand, huner û

wêjeya kurdî, hatiye destnîşankirin.


● 20.06.1980 Serhildana Gelyê Zilan. Eşîrên li herêma Wan, Erdîş û Agiriyê bi taybelî Eşîra Zilan û Celaliyan û yên li der û dorêwan pişî têkçûna hin serhildanan, ji bo azadiye careke din serhildaneke bi 1500 peyayî dane destpêkirin. Ew hêz, roja 20'ê pûşperê êriş ser qereqoleke dewleta tirk dikin, di navbera wan û hêzên dewletê de şer çedîbe. Pişî wê êriş, içar êriş ser Erdîşê dikin; 2 subay û 16 leşkeran dikujin.

Li ser van bûyeran, dewleta tirk alayê 28 û 29'an û alaya siwariyan a 11'an dişne wan 6 eşîrên ku serhildan pêk anîne. Roja 18'ê rezberê, dema şer diqede li herêmê bi hezaran gund şewîfîne, bi hezaran mirov revîne Îranê û ji herêmê bi tenê dûxan radibe.

## AWIR

### ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS




Girtîgeha Amedê kela  
berxwedan û şoreşê ye

BEKIR BAHOZ

Xelîl Xulamî salî 1966 le şarî Serpêlzhaw, le Kurdistanî Rojhelat le dayik bûwe. Her le mindaliyewe sewdaseri hunerî wênekêşan bûwe, dîmenî ciwanî Kurdistan be çem û deşt û çiyawê bandorî zor hebûwe be ser em hunermendewe.

Her boye debînîn sirûst be ciwanî xoy deniwênen, le karekanî da hunermend her le seretay xwendinewe le qutabxanekan da hemû salêk le pêşanga da besdar bûwe. Her weha legal helgîrsanî şorişî gelanî Îran da em be aşkîra le biwarî karî hunerî da karî kirdiwe.

Hunermend Xelîl Xulamî be hoy karekaniyewe ke bezorî derd û azarî



mîletekey nîşan deden metîrsî hebû ke rijêmi iislâmî jîyanî bixene tirsewe, boye welati cêhêst û mawey yek sal e le welati Almanya ye êstaş berdewam xerîkî karî hunerî xoyeti û xoy amade dekat bo birdinewey pêşanga le şarî Berlin.

Hunermend Xulamî dexwazê ke dengî tasawî gelî kurd le rîgay hunerekeyewe be hemû cîhan bigeyenêt û bo em mebestes niyazî heye ke eger boy birexsê direje be xwendinî hunerî bidat le Almanya.

**Mînak le karekanî Hunermend Xelîl Xulamî be nawî "Tawan"**

X webirçîhiştin (mangirtin) ji metodê berxwedanê yên herî pasîv yek e. Mirov li dijî zordesî û çavşorîyê, bi birçîhiştina xwe, bersivê dide dijimin. Ev metoda xwebirçîhiştinê bi piranî li girtîgehaneyan pêk tê; ji ber ku di destê girtiyan de zêde imkânên bikaranîna metodê rengîn ên berxwedan û têkoşînê yên din namînin. Vê carê bi tenê metodeke berxwedanê di destê girtiyan de dimîne ku ew ji xwebirçîhiştin e. Ew bi eziyetdayîn û pûckirina laşê xwe rewşa zorker û serdestan protesto dikin. Di dîroka cîhanê û ya Kurdistanê de, di vî warî de, gelek bûyeren mezîn û gîring hene. Di sala 1982'ân de Girtîgeha Amedê di vî warê xwebirçîhiştinê de, bi nav û deng e. Di dîroka Kurdistanê de berxwedana herî mezîn û birûmet li wir hatiye dayîn.

Wekî ku têzanîn M. Hayri Durmuş di 15'ê tîrmeha 1982'ân de, li salona mehkemeyê rojiya mirinê ûlan kiribû.. Piş re M. Hayri Durmuş, Kemal Pir, Ali Çiçek û Akif Yılmaz bi gelek hevalen xwe ve dest bi rojiya mirinê kirin; bi bîyâdarî ala berxwedanê bilind kirin û di dawîyê de, ev her çar şoreşgerên mezîn ji şehîd ketin. Her wiha pişti şehîdên Newrozê, Girtîgeha Amede carekê din bû şahidê şehîdên rojiya mirinê. Ev bûyer di dîroka têkoşîna Kurdistanê de bû xwediye cihêkî gelek mezîn û gîring. Dîwarên girtîgehê hilweşand û têkoşîn ber bi çiya ve bir, xurt û gur kir. Vê yekê, di dîroka Kurdistanê de, ji bo têkoşîn û berxwedaneke nûjen dergeh û pencereyên nû vekirin.

Ji wê rojê heta iro, Kurdistan û Tirkîye ji aliyê aborî, civakî, rîexistin û eskerî ve serobino bûne û dibin. Her ku diçe dewleta tirk pêngav bi pêngav têk diçe û kurd ji têkoşîn û berxwedana xwe ya neteweyî xurt dikin û pêş ve dibin.

Ji 27'ê adara 1996'ân ve, li gelek girtîgehan li Kurdistanê di serî de li ya Amedê û yên li Tirkîye girtiyan politîk dest bi grevên xwebirçîhiştinê kirin. Niha li hînek girtîgehan girtiyan ku di greva xwebirçîhiştinê de ne, ji 50 rojî ve ye ku di berxwedana xwebirçîhiştinê de ne. Hînek ji wan nêzîkî mirinê dibin. Di vê rewşa han de, hikûmeta ketî û Serokê Polîsan û berê û wezîre Edalete yê niha Mehmet Ağar, hîn ji gef û gurên nedîti li girtiyan birçî dike û dibêje:


"Em bi paş ve tu gavî navêjin, divê ew teslim bibin..."

Li welêt, li metropolên Tirkîye û li seranserê Ewrûpayê ji bo piştgirî û alîkariya girtiyan politîk ên li girtîgehan li Kurdistan û Tirkîye calakî û bûyeren mezîn û xurt têni lidarxistin. Li bajarên London, Bükreş, Atîna, Cenewre, Bruksel û li Stockholmê ji ji sisîyên vê mehê ve çalakiyên xwebirçîhiştinê hene. Edî rewşa kurdan ne wekî ya çend sal berî niha ye. Ev hem ji aliyê rîexistinbûniya kurdan ve û hem ji, ji aliyê derax û seviya diplomatîk a kurdan ve wiha ye. Pêşketinê mezîn hene ku mirov bi çavên serê xwe dibîne. Ez niha bi xwe vê nivîsarî di greva xwebirçîhiştinê de dînîvîsim. Ez berê ji çend çaran besdarî çalakiyên xwebirçîhiştinê bûbûm; lê niha rewş tiştekî din e: Hejmara kesen ku besdarî birçîbûnê dibin gelek in. Kurdên alîkar û piştgir bi hezaran in. Cihên xwebirçîhiştinê wekî şahî û festîvalen mezîn in. Di rojê de, bi hezaran belavok têni belavkirin û bi hezaran kurd û biyanî têni serdanê. Rîexistinîya xwebirçîhiştinê mirov nikare bi çend salen berê re muqayese bike. Rojname, radyo û kanalên televizyonan di heftiyê de çend car li ser çalakiyên xwebirçîhiştinê radiwestin. Li Ewrûpayê edî rîexistinê sîvîl û humanîter li aliyekî, partîyen desthilatdar û yên muxalefetê bi destgulên xwe ve têni cihê xwebirçîhiştinê û mesajen xwe yên piştgirîye pêşkê dikin. Bi kurtahî edî doza kurdan reng û naverokeke navneteweyî girtiye. Bi vê xwebirçîhiştina dawî re careke din rû û rûcikên dewleta tirk a sextekar û durû derket holê. Derbeyeke mezîn xwar û dixwe. Ji aliyê din ve delagasyonen HABİBAT'ê ji, ji Stenbolê demokrasiya wan a sexte û boyaxkirî, dewleta wan a esker û polîsan roj bi roj ji raya gişîya cîhanê re didin diyarkirin. Bi rastî rezil û riswa dibin. Bi destê xwe mala xwe xera dikin. Xwedê bike rojekê berê cûm bibe!



Ragip Duran rojnamevanekî tirk e, lê ji tirkan zêdetir kurd wî nas dikan. Ne tenê xwendeyên kurdan gundiyên wan jî bi munasebeta radyoya BBC'yê wî bi nûçeyên wî yê rast nas dikan.

Ji hêla din ve Duran der barê fonksiyona çapemeniyê de wekî pispot tê qebûlkin. Hevalê me RAHMÎ BATUR pê re li ser mijarênu ku dikevin çarçoveya çapemeniyê axivî.



# 'Çeka herî bîtesîr rastî bi xwe ye'

*D*i dawiya hevpeyvînê de wê min pirsek bikira, lê ez dixwazim vê pirsê di serî de bikim: Ku me cih biguheranda û hûn vêga di cihê min de bûna, dê we ci bipirsiya?

- Li gorî rewşa min û te, ku me cih biguheranda, aliyeke min ê biimtiyaz heye; ez rojnamevanekî tirk im, lê zêdetir li ser pirsgirêka kurdan nûçeyan çedikim û ji ber vê yekê li Kurdistanê gelek kes min kurd dizanin, minê ev bipirsiya.

Ez ji sala 1983'yan û virde ne tenê li ser kurdên Tirkîyeyê, her wisa ji Kazakhstanê bigirin heta Amerîkayê li kîjan erdi kurd hebin, ez bi wan re eleqedar dibim. Weşanêni li ser kurdan, yêni bi zimanê tirkî, îngilizî û fransizî taqîfî dikim, lê mixabin ku kurdî hîn nebûme...

*Ci bûn sebeb ku hûn bi kurdan re eleqedar bibin?*

- Hêj dema min Lîseya Galatasarayê dixwend, di mehêne havînê de me tûris-tîn fransiz dibirin li bajarênu Kurdistanê digerandin, me ji wan re rêberî dikir. Bi rastî min bi xêra wan Kurdistanê nas kir. Wî karî ji sala 1969'an heta 1975'an dom kir. Pişt re ji bi munasebeta rojnamevanî kurd ketin rojeva min.

Ez demeke dirêj li Fransa û Brîtan-yayê mam. Rojnamevanî ci ye, nûçe çawa tê nivîsandin, fêr bûm. Dema ez vegeyiyam û min dest bi rojnamevanî kir, min dît ku li vir ev pirsgirêka giran an di rojnameyan de hîc cih nagire an ji tahrîfatê dikan...

Li ser navê BBC'yê ez diçûm herêmê. Dema bûyer diqewimîn min daxuyanîyen her du aliyan jî didan, ev bû sebeb ku kurd ji min bawer bikin. Derdeki BBC'yê ku dewletê an jî PKK'ê biparêze tune bû, ev jî ji min re bû fir-sendek.

Di destpêkê de me bi hêsanî dikari-bû karênu xwe bimeşanda. Heta sala 1992'yan rojêne me yê xweş derbas

bûn, lê piştî 92'yan her tişt xera bû, dewletê rê li ber rojnamevanîye girt... Gelek hevalênu me yê rojnamevan kuştin. Edî imkanen rojnamevanîye neman...

*Di Newroza 1992'yan de li Nisêbînê serpêhatiyeke we û timên taybet çêbû-bû...*

- Piştî ku êrîşen li ser rojnamevanan zêde bûn, edî min bi nasnameya xwe nikaribû li herêmê bigerim. Baş bû ku di radyoyê de dengê min bihîstibûn, na-vê min jî dizanibûn. Lê ez bi şexsî nas nedikirim.

Em sê çar rojnamevan ji Cizîrê diha-tin, li Nisêbînê riya me girtin. Ji mad û mirûzê wan diyar bû ger ew wî kesê ku

**i her şerî de, şerê psîkolojîk tê meşandin  
û di şerê psîkolojîk de jî rola herî girîng  
li ser çapemeniyê ye. Lê di şerê psîkolojîk de jî,  
çeka herî bi tesîr rastî bi xwe ye...**

lê digeriyan bibînin wê malikê lê xera bikin!.. Yekî çeka xwe dirêjî me kir û bihêrs "Ew i... yê Ragip Duran jî di nav we de ye" got, beriya her kesî min bersiva wî da:

"Dema em hatin Ragip li Cizîrê bû, ew jî li ser rê bû, wê vêga bê."

Piştî vê bersiva min em nedan sekînandin, em filitîn. Înşallah Ragip jî filîtibe!

Ji ber ku rê li ber xebata çapemeniyê, rojnamevanîye digirin ev şer bêhtir diwar dibe. Ku çapemeniyeke serbixe-we hebûya...

*Çapemeniya serbixe heye?*

- Li Tirkîyeyê çapemeniya "mezin" ne serbixe ye. Ev ne tahlileke siyasi û ideolojîk e. Ev çavdêriyek e, tespitîk e. İro hûn li kîjan rojname û televîzyona mezin binêrin tê dîtin ku bi alikariya dewletê mezin bûne. Ev aliyeke e, lê aliyeke din jî heye ku bi dilxwazî dewletê

diparêzin. Ji ber ku ji rojnamevanîye, bêhtir wekî karê propagandayê fêm dikan, terbiya wan a demokrasiyê tune ye.

Ku em li dinayayê jî dinêrin yêne wekî BBC û CNN'ê jî ji serxwebûna xwe gelek tişt winda kirine, ne wekî berê serbixwe ne. Ketine bin tesîra sermayeyê.

Li welatên paşmayî jî em dibînin ku dewlet xwediyê radyo, televîzyon û rojnameyan in. Li welatên pêşveçûyî yê kapitalist, hinek rojnameyan ku xwediyêwan, xebatkarênu wan in hene. Yek ji wan jî li Fransayê derdikeve; Liberation. Ew jî ku ket krîza aboriyê, mecbûr ma ku nêzîkî nîvî hîseyen xwe bifiroşe şirketeke mezin.

**Lê ji xeynî girêdayiya aboriyê li Rojava tiştekî din jî heye ku ew li vir tune ye: Rûmet û namûsa nûçeyê, ehlaqê meslek... Li wir hê jî ev hene.**

Berpirsê nivîsarên Le Mondeyê Edi Planel di kitêbeke xwe de "Dewlet dibêjê ji bo selametiya tahqîqatê veşarî" dinivisîne û dipirse: "Ji kê hûn ci vedişerî? Ev teknolojiya vêga imkana veşarîye nade, tenê dewlet dixwaze li dijî welatiyênu xwe xwedî imtiyaz be. Eger dewlet ji bo selametiya welatiyênu xwe kar û xebatê dike, divê ji welatiyênu xwe tiştekî veneşerî."

Yanê ew agahîyen ku casûsên hemû dewletan pê dizanin, dewlet ji welatiyênu xwe vedişerî.

*Li Tirkîyeyê iro serkomar jî li pey si-rêne dewletê ye... Ji Tansu Çillerê agahîye dixwaze, lê ew sirêne dewletê ji wî jî vedişerî....*

- Erê, yênu ku di nav dewletê de li

cihêne herî bilind in, iro ketine pey sirêne dewletê. Jinikek hin tiştan dizane, lê ji wan re nabêjê, xwe dikan mesquere. Ku civakeke vekirî bûya wê ev tiştên sosret jî neqewimîna.

Em di van rojêne dawîn de tiştên wi-sa ecêb dibîhîzin ku em pê matmayî di-mîn. Dibêjê: "Ku sirêne dewletê eşke-re bikin wê ser derkeve" ev tiştekî sosret e. Yanê tê wê maneyê ku bi pereyên me çûne tiştên tarî kirine, nikarin eşke-re bikin. Ji aliye rojnamevanîye ve divê tu sir nebin ku ji welatiyan werin veşar-tin.

*Rojnamevanî ci ye, divê çawa be?*

- Gelek tarîfîn rojnamevanîye he-ne, lê bi awayekî gişî rojnamevanî ka-rek e ku mirov li gorî imkanan rast, li gorî imkanan dorfirêh û li gorî imkanan bîlez, bûyerên li welatekî û li dînyayê, bi wêne û deng pêşkêşî civakê dike. Tarîfa herî dorfirêh ev e. Ü rojnamevanî neyareş siran û tişte veşartî ye. È sir û agahî jî di destê iktidarê de ye.

Divê di her nûçeyekê de lêkolîn he-be. Lê tespitkirina dikandarekî, ku mil-yonek bac didize, ne rojnamegeriya lê-kolînî ye. Rojnamegerî meraq û têrkirina vê meraqî ye. Yê ku meraq neke ni-kare bibe rojnameger. Kî, ci ji bo ci ve-dişere, çawa vedişere? Divê rojnameger tim li bersiva van pirsan bigere. Ku rojnamevanî baş were kirin, wê civak bibe xwedî agahîyen rast. Ü ji ber ku wê agahî ji bin bandora çend kesen ra-yedarên dewletê derkeve û wê demokrasî çêtir bi cih bibe. Lê bi rastî ku em li Tirkîyeyê û li dînyayê dinêrin, çape-meniyê de yek an jî du xalênu tarî he-ne:

İro ku Aydın Doğan karêne xerab bi-ke, wê kî çap bike, eşkere bike? Ji çaran didoyen çapemeniya tirkan di destê wî de ye. Em bibêjin bila ew didoyen din eşkere bikin, lê ew jî ne paqîj in. Bêşik vêga di destê tevan de dosya he-

ne; dema yek der heqê yekî din de tiştekî eşkere bike, wê yê din jî dosyayekê biweise... Ji ber vê jî mirov xwedî agahî nabin.

Divê çapemeniya alternatif hebe. Û ev çapemenî an bi temamî serbixwe be an jî têkiliyên wê bi kes û rëexistinê li dijî dewletê re hebe. Her çiqas ez bi kurdî nizanibim jî, Azadiya Welat, Demokrasi, MED TV û li Stenbolê gelek radyoyen herêmî hene. Lé hem ji aliye aboriye ve û hem jî ji aliye profesone liye ve këmasiyen wan jî hene. Zêde nikarin vekin.

*Dema têkilî bi sistemê re tune be bideschristina siran jî zehmet nabe?*

- Ev jî heye, lê ketina nav sistemê ne çareserkirin e, dikarin li derveyî siste-mê bimînin û wezifeya xwe jî bi kar bî-nin. Rojnameya Aydinlikê ya ku min tê de xebat dikir, kontrgerilayê bi belgeyan eşkere kir... Divê bi hinek kesen di nav sistemê de jî têkilî hebin, ku bi temamî li derive bimînin, nikarin tiştên veşartî eşkere bikin. Lé têkiliyeye wisa, ku ew bi xwe jî qirêj nebin...

*Li gorî we këmasiyen çapemeniya kurdan ci ne?*

- Çend sal berê ez li Hewlêrê tevî ci-vîna salvegera 90 saliya rojnamevaniya



**işti 92'yan her tiş xera bû, dewletê rê li ber rojnamevaniye girt...**

kurdan bûm. Mesûd Berzanî û Şérko Bêkes jî besdarî civînê bûn. Civîneke dewlemend bû...

Di rojnamevaniye de rola ziman gelekî girîng e û ji ber ku li Başûr ziman qedexe nekirine, kurdî bi pêş ketiye. Li kolanen Silêmaniye û Hewlêrê weki Beyoğlu kitêbîfîroş hebûn, ez gelek pê şad bûm. Min wergera kitêba filozofî fransiz Mişel Fuko ya bi navê "Çêbûna Hepisxaneyê" dît ku hêj ew kitêb li zimanê tirkî nehatibû wergerandin. Ev dide nîşan ku rewşenbîrên Başûr wêje û felsefeya Rojava jî ji nêzîk ve eleqedar dibin. Di Rojhilata Navîn de ji Hewlêrê kevintirin bajar tune. Ew jî di-de xuyan ku kurd di Rojhilata Navîn de xwedî kultur û rewşenbîriyeke mezin in. Lê parçebûyina kurdan û pesta siyasi ya li ser çapemeniya wan, bi taybeti jî ya kurdên Bakur li paş xistiye.

Sebebê lipaşmayîna çapemeniya Kurdistanê ev e ku kurd parce bûne û nebûne xwedî dewlet, ji ber vê sebebê jî yekbûna ziman çênebûye. Di kurdî de sê çar zarava hene: Soranî, kurmançî, dimîlî, goranî... Ev rewş di çapemeniyê de astengiyen mezin derdixe.


Lê dîsa jî ku em hejmara Rojnameya Özgür Gündemê ya yekan bidin ber

hejmareke rojnameya Demokrasiyê emê di rojnamevaniya kurdan de pêşketineke girîng bibînin. Li gorî min MED TV jî gelekî girîng e; ji birçibûniya kurdan a di vî warî de ya sedsalan re bi deng û dîmenen xwe dibe bersiv. Gelek baş e, lê bizanîna min tu tişt bi temamî ji başî an jî, ji nebaşiyê pêk na-yê...

Ev şerê ku panzdeh sal e didome di çapemeniya Kurdistanê de jî dibe sebebê hinek këmasî û xeletiyen: Beriya agahî bide, coş û heyecan, ajitasyon û propaganda li pêş tê... Ev tespîtek e. Yanê di şertê iro de ku nêzikî bîst hezar insan di vî şerî de mirine û ji her alî ve mudaxele çedîbin; imkanen derxistina rojnameyeke bêheyecan, ziwa, serbix-we ne mimkun e û ez xwendevanan baş nas dikim; vê gavê pêwistî bi rojnameyeke wiha tune ye... Pêwistîya iro ji bo dawîya şer bê, eşkerekirina wehşeta şer e.

*Baş e rojnamevaniya di nav vê çarçoveyê de mirov çawa dikare çêtir bi-ke?*

- Ez ne li dijî çapemeniya mîlitan û ajitasyonê me, di nav van şertan de pêwistîya çapemeniyeke bi vî rengî heye, lê mirov dikare çêtir jî bike. Zehmetî



**M in daxuyaniyê her du aliyan didan, ev bû sebeb ku kurd ji min bawer bikin.**

gelek in, ku panzdeh-bîst nûçevanen te hatibin kuştin, ne mimkun e ku tu rojnamevaniyeke baş bikî, rojnameyeke baş derxî. Ji Afganistanê bigire heta bi Filistînê çapemeniya gelên ku di şer de ne bi vî rengî ye.

Yekî ku ji rojnamevaniye fêm neke, bibe xwedîyê rojnameyê û her roj mu-daxeleyî karên nivisan bike, nameşe. Divê yê ku rêveberiya rojnameyekê bike, ji kar fêm bike û selahiyet tam he-be.

Rojnamevanî di nav karan de, kare-kî herî civakî ye. Ku dengeyek tune be, nameşe. Divê bi hemû hêz û kes xwe tê de bibînin. Di nûçeyê de lazim e tu tişt ji rastiya tazî jortir tune be. Ku Türkeş daxuyaniyek bide û di vê daxuyaniyê de qîmeta nûçeyî hebe, divê tu bi-wesîn... Ev namûs û heysiyeta nûçeyê ye û divê mirov vê prensîba pîşeyê xwe biparêze...

*Di şeran de rola çapemeniyê û şerê psîkolojik ci ye?*

- Di her şerî de, şerê psîkolojik tê meşandin û di şerê psîkolojik de jî rola herî girîng li ser çapemeniyê ye. Lê di şerê psîkolojik de jî, çeka herî bi tesîs


rastî bi xwe ye... Íro em çapemeniya Tirkîyeyê rexne dikin, dibêjin "Alîgirê TC.. Alîgirê şer!...", lê ku em jî eynî tişti bi aligiriya kurdan, bi aligiriya aştiyê bikin, tiştek naguhere. Yanê tenê cihê kurdan û TC'yê tê guhertin û hew...

Rojnamevanî û propaganda ji hev cuda ne. Propaganda, rojnamevaniye dikuje... Divê rojnamevan bêghertin û bêtewandin rastiyê binivisine, ew rastî ci dibe bila bibe. Dibêjin berî her tişti ez insan im, bi dû re rojnamevan, ev ne rast e... Carinan tiştên wisa diqewimin ku dilê mirov hilnade, divê mirov nenivisine, lê ji ber ku tu rojnamevan î, di-nivisîn...

*Piştî sùiqasta Demirel, Ertugrul Öz-kök "Iran li dijî me propagandayê dike û ev di destê meczûpên wiha de dibe çek" nivisandibû. Hün vê çawa dinirxi-nin?*

- Ev dide nîşan ku propagandayê jî nizanin baş bi kar bînin. Ku welatiyên te, li te û li serokê komara te bawer ne-kin, herin li çapemeniya Îranê bawer bikin, sûcê mîrikê Îranî ci ye? Divê tu ji xwe û ji sistema xwe bipirsî. Ji bo ci welatiyên me ji me bawer nakin?..

Li Sovyeta berê kî ku li dijî sistemê




**ojnamevan; kî, ci ji bo ci û çawa vedîşere? Divê tim li bersiva van pîrsan bigere.**

derketa, ew diavêtin timarxaneyê. Mantiq jî ev bû: Tu li dijî sistema Sovyetê derdikeyî, nêxwe tu dîn ! Li Amerîkayê jî ji dijberan re digotin "Tu yan mirovîk xerab ï, yan jî dîn ï!" Ev çîroka "meczûp" û ji ji wan mîras maye. Ci kurd, ci ereb, ci faris û ci tirk bin, hê jî pûtan dihebin. Yekî Quran hilda got "Pûtan nehebîn, ez we dawetî Quranê dikim" ew girtin, avêtin hepsî û ji bo wî gotin: Dîn e!.. Yanê ji wan wer e ku yet Atatürk rexne bike, koka komarê radibe. Ne Atatürk tenê, divê em li hemû kesan bi çavekî rexneyî binêrin.

*Wekî xwendevan û temâşevane kî di serê Ragip Duran de, ji 1'ê gulanê ci dîmen man û bi nîrîna rojnamevan Ragip Duran rastiya wê bûyerê ci bû, di serê we de ci man?*

- Wekî xwendevane kî an jî temâşevane kî di serê min de ev dîmen man: Ciwanan cam û pencere anîn xwarê.. Li gorî nîrîna rojnamevan Rugip Duran jî, tiştên di serê min de man, ev in:

Sê kes hatin kuştin!.. Kî, çawa û ji bo ci ew kuştin?.. Li tu deverê dînyayê, bi camen şikestî kes nikare sê kuştiyan veşere. Lê, li Tirkîyeyê çapemenî bihuner e!..



**Ragip Duran**

**D**i sala 1954'an de li bajarê Stenbolê hatiye dînyayê. Ji malbateke burokrat a bilind e û li gorî gotina wî; bi kultura kemalîzmê, lê zêdetir jî bi perwerdehiya Rojava, bi terbiye bûye. Piştî xwendina Lîseya Galatasarayê ji bo xwendina zanîngehê çûye Fransayê û di sala 1978'an de vege riye. Li dû vege re di rojnamevaniye Aydinlikê de dest bi rojnamevaniye kiriye. Piştî re di rojnamevaniye Hürriyetê de, di BBC'yê de, di Radyoya Stockholmê de, di Cumhuriyetê de, di Noktayê de, di EP'yê de û di rojnamevaniye Özgür Gündemê de rojnamevaniye kiriye.

Pîşeyeke (meslek) wî ya din jî werger e. Di civînên navneteweyî de bi Îngilizî, fransizî û tirkî wergeriya sîmûltane dike.

Li ser Afganistanê kitêbek bi navê Afgan Mücahidleri ile (Bî mucâhîdîn afganan re) nivisandiye, ji fransizî jî du kitêb wergerandine. Vêga jî, ji nivîsên xwe yên kevn û yên nû kitêbek bi navê Apoletli Medya (Çapemeniya Biapolet) amade dike.

Di dadgeha ewlekariya dewletê de li ser nivîseke xwe mehkeme dibe. Endamê Heyeta Şêwîrmendiya Weşanê ya Rojnamevaniye Demokrasiyê ye û heftiyê carekê li ser çapemeniyê di demokrasiyê de dînivisîne.

# Ji Negwînê çend helbest

**Evîn**

Tu û baran  
bi hev re dihatin  
baran dima  
û tu diçûyi.

**Tu**

Koçberiya min  
ku bi sedsalan dirêj bû  
tarî bû  
û min jî  
tu çira hilnegirtin  
ji bili te.

**Temen**

Welaî me rawestiyaye  
Gundên me  
nayêñ guhertin  
Roj lê ew roj in  
Heyy lê ew heyy e  
Demsal digindirin  
Ü em jî  
yeko  
yeko  
tene xwar.  
  
Li benda qiyameîe

**Şewat**

Mîna jînekê  
ku biryara  
şewitandina cîhanê da  
xwe vêxist  
û cîhan pê hest nebû.

**Veger**

Westiyayî vegeriyame  
ey kelempêrê dil  
de ka rûyê min i xemgîn  
di nav her du desten xwe de  
veşere.

**Hezkirin**

Hezkirina te  
buhar e.. û ez li bendê me.  
Hezkirina te  
nêrgizeke bitenê ye  
li ser qeraxê dil  
hezkirina te  
dara tuwa ku  
di dilê vî çemî de şîn hatiye

**Tenêtî**

Derbas bûm kinişteke vala  
diwaran  
mûmîn sar  
bigermî, silav dan.  
Çavêñ min ên xemgîn  
li dûr dînihérin  
li dilê wêran  
û..  
li xaçê razayi.

**Koçberî**

Jê re got:  
Dinya, roj e, heyy e, erd e  
jibirkir ku bêje:  
û tu yî jî  
ji ber vê  
dev jê berda û .... çû.

**Gazî**

Ey bêhiço  
heta bi rûpelan  
dikarin bêhna te  
bêhn bikin ji pênuşa min.

**Tirs**

Destê min jar e  
Pênuşa min xemgîn e  
vê evarê  
ez li ser te ditirsim  
Jixwe



**Negwîn:**  
Di sala 1973'an  
de, li  
Başûrê Biçûk,  
li bajarê Amûdê  
ji dayikê bû.  
Ew neviya  
zimanzanê bi  
nav û deng  
Reşîdê Kurd e,  
lê mixabin  
Negwînê  
helbesten xwe  
bi zimanê erebî  
nivisandine.  
Helîm Yûsiv,  
ev helbest  
hilbijartine û  
wergarandine  
kurdi.

heta kengî  
tê bibezi li dû rokê  
roka ku te nas nake.

**Têbir**

Dibe ku min dengê beranê  
ji bîr kiribe  
dengê diya xwe  
dengê te


dengê avê  
dengê ba  
Lê.. tu car ji bîr nabe  
dengê tiliyên te, dema  
ku porê min şeh dikirin.

## Dilşastan


Zindan di çermê min de  
şîn hatine  
li gewde dikin hewar:  
Xwedê derziya me ye  
ey xwînê  
û tu ta tune ne ji bilî axê  
ez li ser ranekî ji xwînê  
radikevîm  
Ta ku ez şoreşvanan di xew  
de bibînim  
Dema ku kute kuta dilê min  
di damarêñ te re derbas dikirin.  
Gotin: dilê te yî xwînrej şiyar bûye  
li ser xecxecokên birîna wê  
li ser textê xwîneke kor.  
min got salek e  
du sal in  
sê sal in  
çar in.. pênc in.. şeş in.  
Û ez artêşek ji bendemanê me  
Roj bi roj  
ez radihêjim wêneyê wê  
Ta ku ez bîranînan bîn bikim  
Guneh e ey dilşastana min

guneh e.. guneh.  
Laşê te hate cem laşê min  
û got: Ez bi fişekan nemirim  
lê ez bi hezkirinê mirim  
min guman kir ku xanima min  
vegeriyaye

erê .. vegeriya  
Ji nû ve tev birînan  
berê xwe bi xwînê vekir  
Ta ku bizewicin.  
Çiqas tu xweşik i ey nedîdar  
Ji ber ku tu xaka me yî  
Tu dane hev toz bi toz  
Ta ku tu zarotiya xwe  
bigihîne axê  
Tu dane hev xwîn bi xwîn  
Ta ku tu zarotiya xwe  
bigihîne xecxecokan  
ax .. çiqas hişk e ev çiya  
çiqas serhişk e  
Her ku pakrewanên me  
destan dirêjî wî dîkin  
Perdeyên xwe bi ser  
xîna me de xwar dike.



**Helbestvanê kurd Loqman**  
Mehmûd di sala  
1966'an de li  
Başûrê Biçûk  
li bajarê Amûdê  
ji dayikê bû.  
**Dîwana wî ya bi navê 'Kêfîn Bixem'**  
di sala 1990'i de  
li Şamê bi  
zimanê erebî  
hate çapkirin.  
**Loqman**  
Mehmûd ev  
helbesta xwe di  
meha adarê de  
bi zimanê kurdi  
nivisiye.



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê li Şaxa Beyoğluyê, vê heftiyê ev çalakî hene.

● 16.06.1996 Yeksem

Şanoya Ronî 'Lîstika Sher û Koçberî', saet: 14.00  
Konsera Grup Yorum, saet: 18.00

● 19.06.1996 Çarşem

Seminera weşanvan û rojnamevan Ragip Zarakolu der barê 'Dîroka nîjadperestiyê' de, saet: 18.00

● 20.06.1996 Pêncem

Seminera Tuğrul Eryılmaz bi navê 'Li Tirkîyeyê û li Dînyayê rojnamevanî',

saet: 18.00

● 21.06.1996 În

Ji NCM'ê Beşa Hunerên Dîtbariyê Film "Asî'nin amacı", saet: 18.00

● 22.06.1996 Şemîr

Konsera Stranê Gelêri yên Nûjen, saet: 14.00  
Konsera Figen Genç û Kadir Demirel, saet: 18.00

Li BEKSÂV'ê jî vê heftiyê;


● 19.06.1996 Çarşem

Konsera Grup Kızılmak, saet: 18.30

## RÜDAN

### TÎŞK

LERZAN JANDÎL



### Nivisnayena dîroke

**S**e ke êno zanayene, dîkoka şaran, avêsiyena şaran de rolêde gelê bîqedr kay kena. La belê eke dîroka jû şarî hetê kesanê bînan ra, kesanê xerîban ra ama nivisnayene, na seba ê şarî afatêde girs a. Eke nê kesan dîroka nê şarî înkarkerdena dê ser ava kerda, na afatêde girsêri ya. Halê kirmancan jî tenê niyanê o. Dîroka dînan, ya tirkan înkarderdene ser nivisna yan jî zê farisan, ereban kêm û şâş ama nivisnayene. Xêca nînan tenê zanayanê xerîban jî dîroka kirmancan nivisna. Hama se ke êno zanayene, nînan de jî gumra kîmasî û şâştiyî estê. No hetêde dîroka ma wo.

Heto bîn ra kirmancan ebi xo jî dest kerdo ci, dîroka xo nivisnenê. Na dîrokenivisnayene newe wa. La belê çığa ke newe wa, hundê jî lewê râştiye de, kemasiye, şâştiyî tede esta. Bêguman sebebêne naye zaf ê. A jûyîne; na der heq de materyalê ebi nivisi ya zaf kêmî yê, yan jî qe cînê. Koledaran, materyalê ke, mordem şikîno dîroka kirmancan nivisnayene de ci ra fayde bivîno, kerde vîndi yan jî hîn dardê we, ke kes nêşikîno ci reso. Ê didîne, tayê kirmancen ke wazanê dîroka ma binivînê yan jî nivisnenê; ya na der heq de wekintena/wekintenanê bingehînan nêkenê, yan jî wazanê; dîroke gor wayştena xo binivînê. Na der heq de tewr xirab jî dîroke gor xo, gor hal û kompleksanê xo nivisnayen a.

Xirabiya ke mordem şarê ma rî bikero, a wa ke; mordem dîroke gor hîsanê xo, gor kompleksanê xo, bê wekintenon binivîsno. Zaf kesî bingê her avêsiyena teknîkiye, kultiriye, şaristaniye û hemdemiye ano kirmancan ra girê dano. Bêguman nê avêsiyenen de ked û emegê kirmancan yan jî verşaranê kirmancan esto. Hama mordem nêşikîno ke naye ra veciyo û zê dîrokenivisnayena tirkan, her cî kirmancan ra girê do.

Eke mordem dîroka ma niya binivîsno, pênyiya ma jî bîna zê pênyiya tirkan, farisan, ereban ûêb. Zaf rînd êno zanayene, demê Osmaniyan de şarê tirkî, yan jî qesa "tirkî" manêde negatîf guret bî. İttihat Terakkî ú bado jî kemalîstan waşt, ke tirkan na hal ra ra xelesnê. Hêya koledaran xo na hal ra xelesna ra. La belê şarê tirkî kerd kor, kerd koleyên ideolojiyanen faşîst û râsistân. Dawiya na diyene, şer ê, hêşîrên çiman ê, feqîrî û belengazî, dişmentî û kîşten a. Û ew ro jî binê barê mesela kirmancan û şaranê bînan de, ebi metodanen qefçilan restî dawiyêde henêne, ke ew ro roşnabîren dînan jî nêşikînê binê na qefçiliye ra biveciyê. Na bi xo teyna, ganî ma re dersêde bi qedre bo.

(...) Xirabiya bîne jî a wa, ke mordemo ke wazeno dîroka kirmancan angorê waştena xo, angorê kompleksanê xo binivîsno. Nivisnayenêde niyanêne de kirîteren biyane, râştiye cînê. Ya wendekar dîrokêde niyanêne bê fikiriyene qebul keno, yan jî red. Hama ganî bêro zanayene ke armancê dîrokenivisnayene şâştiyan, qelsîyan û xirabiyan ra derse veten a. Armancê dîrokenivisnayene diqor nêkerdena nê şâştiyan û xirabiyan a. Yanê filan dem de niya biyo, na biyene rînd nêbiya. Sebebê naye çik biyo? Çinay rî niya biyo? Ma se şikime xo nê şâştiyan, qelsîyan, xirabiyan ra ra xelesnîme. Armancê dîrokenivisnayene o niyo, ke mordem ebi verhukman (pêşdarazî), ebi neheqîye tenê kesan, grupan, qoman xayîn, gunakar kero, tayîne jî "zaf" qehremân kero. Niyadayanêde niyanêne qehremanan, râştan "zaf" kena qehremân û raşt: xayînan, şâşan jî "zaf" kena xayîn û şâş. Çim ke kirîteren qehremantiye, rîndiye yan jî xayîntiye, şâştiye waştena zerê niviskarî, kompleksen dê bi xo yê. Niyadayêne de niyanêne objektifîtiye ra dûrî ya. Gor daye çîyî bê sebebân, bê dawîyan ya sipê wê yan jî siya yê. Çim ke mordemek angorê zerê xo nivisneno, hîn wazeno. Eke dîroke ebi "xezila ...", ebi "eke ... bibiyene", yan jî her cî ra muhîmtir jî bê wekintene, ebi diyenêde jûhete, dîroke bêro nivisnayene, dawîya xo jî zê nivisnayena xo şâş êna.

Ganî nê kesî bizanê, ke zê her şarî, şarê ma miyan de jî verhukmîn aşîtiye, dîni, sosyalî û heta zerê çeyî jî estê. Her şarî de kesîtiyêde corêne û kesîtiyên cêrînî estê. Ya corêne jûbiyena şarî de rolêde bingehîn kay kenê. Yê cêrînî jî dewlementiya şarî ya. Ganî armancê dîrokenivisnayene tûjkerdena, jûbînî ra dûrî fiştena nê kesîtiyan nêbo. Hemverê naye, dîrokenivisnayene ganî xizmetê werêarden, nêzdikerden û avêberdena nê kesîtiya bo. Na der heq de tayê kesî iñat nê şâştiyan kenê. Eke nê kesî bawar kenê, ke ebi naye xizmeta şarê ma, xizmeta zanayene-îlmî, xizmeta jûtiya şarê ma kenê, wa na bawariya xo ra derbas bê. Qeyî tivana, ebi nayê wazenê, ke verê jûtiya şarê ma de, verê wertêrawedardayena verhukanê wertê şarê ma de bivinderê. Çim ke pratîk de çeperaştê bawariya dînan bene.

## Şakiro: Kewê ribat

**h**eta çar sal berê, ci dengbê-jekî ku destê xwe bida ber guhê xwe û bistira, min ew guhdarî nedikir. Fikra min ew bû ku dengbêj bi kilamên şeran neyartiya di nav gel de kûr dikirin û xelk berî hev didan. Yanê li gorî min ew dirêjanên neyaran bûn...

Ji aliyê din ve min ji wan fêm nedikir. Çawa ku bi şûrên tazî siwaran dabine dû wan, van malnemîratan wisa bi lez kelîme li hev siwar diki-rin!

Heta min kelîmeyek fêm dikir, wekî ku av di torê re derbas be he-re, deh-panzdeh kelîme dipekiyan diçûn, guhê min ew zeft nedikirin!..

Belkî jî, ji ber ku dilê min li wan girtî bû, min ji wan fêm nedikir...

Çar sal berê li Stenbolê yekî kasîfiroş ku got "Rojekê min kaseta Şakiro lêdixist, di jêra cihê min de riya erebeyan derbas dibû. Erebeye-kê ji nişka ve frêne kir û errebaya li dû jî, lê siwar kir...".

Xwediyê erebeyê peya bû, lê li errebaya xwe xwedî derneket, bi lez hate jor û ji min re 'Çend kaseten vî hebin bide min!' got. Pişti ku kaset kirîn jî 'Çawa min dengê Şakiro bi-hîst, bêhemdê xwe min pê li frêne kir. Di rûyê wî de errebaya min jî çû,

lê bila canê wî sax be!...' got û çû..." min meraq kir...

Bo ci wisa girêdayiyên wî hebûn? Ku hunereke wî, cewhereke wî tunebûya, ev ne mimkun bû. Min çend roj li ser hev guhdarî kir lê bi rastî dîsa min tiştek jê fêm nedikir, guhê min zeng girtibûn. Lê dengê wî?..

Ew ne şalûl û bilbil bû. Kew bû...

Kewê ribat!..

Dengê wî ne ji deştan, ji çiyan, ji zinarênil dihat!..

Pişt re ez jî li gorî xwe, gihiştim kûrahiya evîn û cenga wî..

Par ji bo ku pê re hevpeyvînê bîkim, çûm Îzmirê, lê qebûl nekir. Dilê wî şikestî bû "kurd li dengbêjên xwe xwedî dernakevin, Veyselikî tirkan hebû ku te bidîta, dilê te li hev diket, sê roj te nikaribû xwarin bixwara, lê Resoyekî me hebû, hostayê me tevan... Birçî mir..." digot. Gilî û gazinê wî gelek bûn. Ev çend sal bûn ku kilam nedigotin.

Ew jî çû...

Ji me re, ji wî dengê bilind Binevsâ Narîn, Keremê Qolaxasî, Bavê İpekê, Sofiyê Xerzî û gelek kîlamên nemir man...

R. DILOVAN

# Ala di warê xelasiyê de

**Y**anzdeh keçikên xwe dabûn mîr, yanzdeh dîlan di wî xaniyî de derbas bûbûn. Lî tu dîlanê bi qasî wê biryarê dil li wan xweş nekiribû.

Gulê li aliye kî gore û fanêre qat dikirin, li aliye kî jî gazinê xwe li mîrêne xwe dikirin:

– Tu jî îsal şivan bûya niha ez jî bi te re dihatim, belqitiyê belqitî. De derxe, derpê jî xwe derxe; ez bêrîkekê pê ve bidirûme pişta min bi te ne rast e. Tu yê pereyan winda bikî.

– Dê werin li min û vê belengazê binîherin: ew jî riya rava min dike. Keçê ew ne şuxulêne te ne. De rabe bêbavê ez jî birçibûna sews bûme.

– Ma çima tu nizanî ew mitirbêne parsek wexta mirovan û malan se (lêgerin) dikin, pere (dirav) û tiştan jî mirovan distinîn.

– Qey bendera bavêne wan e; dê ew tiştek wisa bikin ezê di gora bavêne wan nim.

Gulê bangî keçika xwe kir:

– Nexşê, ka wê katuya ketî bi tevî hinêk çeqilmastê jî bavê xwe re bîne.

– Hêk tune ne?

– Bi gora bavê te du heb hebûn, min ew jî firotin pê bişkok ji fanêreyê Misto re kirin.

Nexşê bi tirs gote diya xwe:

– Dayê, hinek toyê ser mast bide bavê min.

– Jan ketiye dilê te û bavê te! Ezê tayek por bi serê te ve nehêlim!

Bazde, here ji mala Mamo derziya hûrik bîne.

– Dê wele ez narim (naçim); bûka wan ne li mal e, pîrê nade. Ew a tima!

– De here, ma wan deh derziyêne me winda kirin.

Gulê zivirî ser mîrê xwe û bi lavatî:

– Tu satilê neçelqînî, bila toyê wê xera nebe.

Misto ji toyê ser mast pir hez dikir.

Kerem bi kenîn:

– Bes dînê bes e, tev li hevûdu rîz-kirine ma qamyona bavê min heye. Tirsa min ew e ku leşker dest bidine ser, tew nedine Misto.

– Wele giş keda me ya helal e. Heya qadîn şevan ez û Nexşê dixebeitîn.

– Tew, ma xema gûrên har keda we ye..

Gulê bifedî û şerm destê xwe ber bi bêrika xwe bir, pêncî hezar derxist da mîrê xwe û daxwaza xwe got:

– Ji Diyarbekirê şarekê jî min re bîne, carinan diçime cihan tiştune ye bîdime serê xwe.

Xew nediket çavêne wan. Her yek di keyaleke germ, kûr û dûv dirêj de geh şad dibûn geh jî singê xwe ji xemgîniyan re fireh dikirin. Nexşê ji cihê xwe rabû çû cem diya xwe; serê xwe da ser singê diya xwe. Diya wê bi çepîlen wê girt ew wê de avêt û nifir kirin:

– Wîî! Tu di agir de bê şûstîn. Ma

**Xalo mirovên van deveran tev dizanîn. Haya qereqolê jî jê heye; bi qasî du mehan leşker bi nobedarî danîn ber. Leşkeran her şev al diçirandin, lê bi sibehê re dînihêrîn ku dîsa jî al wa ye li ba dibe.**

cih tune ye!

Kerem di cihê xwe de sar bû. Bi metelmayî û qehir:

– Keçê çi bi te hatiye?

– Pûnika mirîskê sar bûbû, min jî, hêk kirin paşa xwe. Jixwe maye çar

roj çivîk derbikevin. Ma ci xêr ji pûnika sar tê. Vê havînê min bi pereyê mişkan çay û sekir kirî.

Bi zereka sibehê re hişyar bûn. Kerem tamatî û alav hildan.

Gulê elbek (satil) av li pêsiya wî ri-



jand û daxwazêne xwe gotin:

– Bêhna Misto teng neke. Dil li wî zirav neke; behsa tiştêne xweş ji wî re bike. Bila dilê wî fireh û şad be.

Nexşê paçikek dor çekirî û rengîn dirêjî bavê xwe kir û got:

– Ha bavo, vê pêşgîrê bide keko.

Kerem serê Nexşê mîzda û çû.

Ava Mezin bi gimîn û nalîn bû; dar, qırş û qîrn serobino dikirin. Şîfîrê dolmîş kûlmek li dîreksiyon da û got:

– De li vî çemî (robar) binîherin, ji xwe re kiriye adet her buhur (geçit) se-riyan dixwe. Sala çûyî heft mirov kuştin, do jî xortekî bîst salî û dergistî kuştu. Mala wan ne aya be rojê bi tonan derb û bombeyan di ser serîn me de di-barînin, lê pirek li ser vê buhurê ava na-kin.

Cîxare di qada pêçiyê Kerem de li ber xelasiyê bû. Hingiya cîxarê kin bûbû, bi cîxarê re pêçiyê xwe dixistin devê xwe. Ji ber bêhna kûr, dixanê çavên wî jî wekî ava mûradê şêlo kir, di çavên wî de jî gelek dixeniqîn.

Piştî dilopên hêstiran ziwa kirin, go-te şîfîr:

– Bextê me û Ava Mezin e! Xwedê derdê we rawa me neke.

– Xalo, hûn sax bin lê weleh rewse-ke xedar e. Mirov, birçî û har bûne. He-la metropolan, bûne gola gû heşayî we.

– Lawo bi Xwedê tu ferq ji bo me tune ye; ji beriya bi hezaran sal, heyâ û xwarina me nan û toraq e. Ji xêr û bereketa vî welatî ye ku em ew qas li ser xwe ne. Bi pel û pincarê be jî em birçî namînin. De bila hinekî jî ew bi rewşa xwe bigirîn.

Deşta Müşê mîna xalîçeyeke rengîn di navbera ciyayan de raxistî bû. Çavên wî bi ciyayê Nemrûdê ketin Nemrûdê bi şes beşan mil dabû hevûdin û bi xêleyeke spî şewl dida.

Gava dolmîş ket çiva Norşînê yekî qirangê rê rava rîwiyan kir û wiha got:

– We ev ala ha dîtiye, ew al du sal e li ser wê gorê li ba dibe.

– Ala tirkân e?

– Na, ala rengîn e, ala kurdan e.

Kerem ji nişka ve ji cihê xwe qiloz bû:

– Çawa! Ê çawa dihêlin, li ber vê rê, aha Norşîn! Ma haya qereqolê jê nîn e?

– Xalo mirovên van deveran tev dizanîn. Haya qereqolê jî jê heye; bi qasî du mehan leşker bi nobedarî danîn ber. Leşkeran her şev al diçirandin, lê bi sibehê re dînihêrîn ku dîsa jî al wa ye li ba dibe.

– Xofê ez girtim...

– Xalo ev ser şerê şeref û namûsê ye. Hêj xurînî bû, tu tişt nexwaribû, lê birçibûn nedihat bîra wî. Heya nava Norşînê jî çavên wî li ala di warê xelasiyê de bû.

# 'Stran û Sang'

**Strana Ciwan Haco  
"Gula Sor" ku helbesta  
Qedrî Can e û strana  
Aramê Tigran "Newroz"  
ku helbesta Cegerxwîn e  
wekî stranê folklorîk  
hatine nîşandan.  
Ev ne tiştekî rast e.  
Jixwe strana  
"Gula Sor" ji her aliye  
xwe ve qet naşibe  
awaz û meqamên  
stranê gêlerî  
yên kurdan.**

**Her wisa "Newroz"  
ji, ne straneke  
folklorîk e. Çendî ku ji  
aliye awaz, teşe û  
meqamê xwe ve bişibe  
yên folklorîk ji.  
Ji ber ku hem kesê ku  
helbest nivîsiye û  
hem ji awaza  
(melodiya) wê çekirine  
diyar û eşkere ne.**

**S**tran û Sang, navê pirtûka Rojan Hazim e ku ew li derveyî welêt, li Ewrûpayê dijî. Her çiqas ev pirtûka wî ji stranê kurdî û dânişmarkî pêkhatî û dagirtî be jî, ew bi ziman û çanda kurdî re jî eleqedar dibe, li ser vê yekê bi taybetî di weşana Enstîtuya Kurdi ya Parîsê 'Kurmancî' de gelekkot gotar û nivîsên wî derketine.

Pirtûk ji 5 beşan pêk hatiye. Di ya pêşin de 13 stran bi tevî notayêne xwe hene. Ew hem bi kurmancî û hem jî bi dânişmarkî ne. Jixwe, eslê wan stranan dânişmarkî ne û gotinêne wan ji aliye Rojan Hazim ve li kurmancî hatine adaptekirin. Stranê vê beşa hanê tevde li gorî asta (musteweya) zarokan in.

Beşa duduyan ji 8 stranan pêk hatiye. Ew jî digel henek û leyza zarokan bi awazeke serbest têne strîn.


Ew bênotâne ne û 5 heb jê ji aliye Rojan Hazim ve hatine çekirin, sisê jê ji gelêrî (anonîm) ne.

Di beşa sisêyan de jî, 6 stran hene ku di bin sernavê "Çend stranê folklorîk yên binote" de hatine dayîn. Weki ji sernav jî dixuye, stran binota ne, û tevde ji gelêrî ne.

Di beşa çaran de, dîsa 6 stran hene û bi sernavê "Çend stranê folklorîk yên bênote" hatine pêşkêskirin. Di vê beşê de ji bo nimûne; strana Ciwan Haco "Gula Sor" ku helbesta Qedrî Can e û strana Aramê Tigran "Newroz" ku helbesta Cegerxwîn e wekî stranê folklorîk

hatine nîşandan. Ev ne tiştekî rast e. Jixwe strana "Gula Sor" ji her aliye xwe ve qet naşibe awaz û meqamên stranê gelêrî yên kurdan.

Her wisa "Newroz" ji, ne straneke folklorîk e. Çendî ku ji aliye awaz, teşe



û meqamê xwe ve bişibe yên folklorîk ji. Ji ber ku hem kesê ku helbest nivîsiye û hem ji awaza (melodiya) wê çekirine diyar û eşkere ne.

Beşa dawî ku bi sernavê "Marş" hatiye navandin, ji 4 sirûdan hatiye pê. Sîrûd ev in ku bêyî nota ne:

Ey Reqîp, Birayê delal, Kurdistan-m ka!, Min divê her tim bilind bî.

Li dawiya pirtûkê, bibliyografîyayek heye; tê de der barê nasnameya stranê de agahî hene.

Lê xweziya ew agahî ne di dawiya pirtûkê de lê, di binê her stranê de cihê cihê hebûna. Wê demê dê baştîr bibûya. Lewre di destpêkê de mirov lê wernaqile ka der barê wan de tu agahî hatine dayîn an na.

Ji bo hêsanîyê ew "Bibliyografîya" wisa nehatibûya dayîn bi ya min dê çêtir bûya.

Em der barê nasnameya berhemê de jî hin agahîyan bidin. Pirtûk ji aliye Weşanxaneya Xanî û Bateyî ve di sala 1994'an de hatiye çapkirin. Tevîhev 113 rûpel e. Di pirtûkê de agahîyek wiha heye: "Ev pirtûke bi hevkariya Wezareta Karênavînî ya Danmarkê hatiye çap kirin."


Her çiqas di "kurtepêşgotin"ê de Rojan Hazim "Bi hêvî û daxwaza ku pirtûk taybetî di warê perwerda bexê zarokan û dibistana da valahiyekê tijî bike û bîkîr bê" ji, başebaş ne zelal e ku ka bi ci mebestê ev berhem hatiye amadekirin.

Çendî ku di destpêkê de tiştîn ji bo zarokan bi giranî hebin jî, di beşen dawîyê de mijar bi aliye kî din ve çûye. Heke ji bo zarokan ev pirtûk hatibe amadekirin ji, ji bo wan zehf giran e?

M. RONAK

## Rexneyek li çapemeniya kurd

AHMET BARÂÇKILIÇ



**C**alakiyê rojiya birçîbûnê li Girtîgeha Amedê, dest pê kir û li gelek bajarên Kurdistan, Tirkîye û Ewrûpayê balav bû û didome.

Béguman em kurd ji van çalakiyan ne dûr û biyan in. Her çalakiyek, armanceke wê hene. Ji bo doza gelê kurd hemû çalakî, liv û sazî gelekî girîng û pêwist in.

Lê çalakiya birçîbûnê, bi taybetî berxwedana Amedê di dîroka têkoşîna gelê kurd de cihekî gelekî girîng distîne. Mirov dikare bibêje, berxwedana Zîndana Amedê bûye kîlîta vegera welêt, bûye berbanga hilpişkîna 15'ê gelawêjê û her wiha jî berbanga gelek bûyer û pêşketinan. Berxwedanvanê zîndanan, di rojêن herî hov û tarî de doza Kurdistanê berdewam kirin, bêhn û moralîn mezin dan ên derive. Bi vê jî neman, gelê me hişyar û bitevger kirin.

Ez naxwazim zêde li ser girîngiya berxwedanê zîndanan rawestim, ji ber ku jî me hemûyan re eyan û eşkere ne.

Tiştê ku ez dixwazim bînim zîmîn, ne rewşa berxwedanvanê girtiyan e., ne jî rîzîkirina bandoriya wan, an jî rola wan di têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê de ye.

Lewre ev tişt gelek caran û bi dorfirehî sed carî ji me baştîr hatine şîrovekîn. Bi dehan pirtûk li ser hatine nivîsandin û tişt herî girîng di jiyanê de dane jîyandin û bi deh hezaran gel rakirine ser piyan. Ji bo van guhartîn û pêşketinê ecêbîşî û bêhempa, ez dibêjîm pêwist e mirov fêm bike, keda wan, berhema wan bibîne, bersiva wan bi nivîs û çalakiyan diyar bike û hevkariyê nîşan bide.

Em dinêrin û temâse dikin, çapemeniya tîrkan, nabîne, nabîhîse. Ji bo pênûşûrên çapemeniya tîrkiyana girtiyan ne girîng e; daxwaz û serkêsiya Aşgar û şîrîkîn wî girîng e. Ji ber van sedeman jî nabîjin, nanîvisin, dixwazin berxwedanê bêdeng bihîlin û dengen girtiyan nagîhînin raya gişî.

Ez gazinc û lomeyên xwe ji çapemeniya komara tîrkiyana girtiyan ne girîng e; daxwaz û bangeşîna şerî taybetî ji xwe re erk û delamet girtiye, bi zanistî û profesyonelî

karê xwe didomînîn.

Ma gelo çapemeniya kurd ci dike? Mixabin ji bo ku jî aliye dewleta tîr ve tûşî astengîyan nebin û bala dewletê nekşînîn ser xwe, ew jî xwedî li girtiyan azadiyê derakevin, dengen wan nabîhîsin.

Girtiye azadiyê ji Girtîgeha Bayrampaşa Stenbolê nameyek bi rî kiriye.

Di vê nameya xwe de diyar dike ku rojnameya Demokrasiyê li gorî daxwazî cih nade dengê wan. Her wiha jî ew gazincan li wê rojnameyê dike.

Li gorî ku girtiyan azadiyê dibêjîn, rojnameya xeta berxwedana rojnamegeriya azad nadomîne ji bona wê ye ku ez dibêjîm girîngiya berxwedanê zîndanan nehatîye fêmkirin an naxwazin fêm bikin. Ger rola xwe neleyîst, erk û delametên rojnamegeriyê bi cih neanîn, girîngiya wê jî namîne. Béguman rexneyê min ji bo hemû rojnameyan nîn e. Mixabin di van çalakiyê zîndanan de gelekî zelal hat dîtin.

Ez hêvî dikim ku rojnameyan û hemû çapemeniya kurd hevkariyê nîşan bide û dengen wan bigihîne raya gişî.

Bi van hêviyan berxwedanvanê zîndanan re silav dikim û serkeftinê dixwazim.

# Ji bo Îktidarê keftûlefta Bihuştîyo

**L**i welatê Bavo dîsa her tişt bûye kafir keratî. Hikûmeta ku bi darê zorê hatibû avakirin (li me negirin em bi devê xwe şihîtin) pelîşî û terq lê ket. Her yek bi aliyekî ve teriqî.

Mesoyê Lévdormik û Çavşaşa Dêlegur hev berdan. Bi vî awayî, ew zewaca fermî jî qediya. Roj bû roja Xoceyê çavbeq û devbigilêz.

Şerûdên ku li welatê Bavo serwerên veşarî ne, nexwestibûn ku Mesoyê Zimangiran û Xwediyê Nifteya Bihuştê, bi hev re bêne ser text. Bihuştîyo yanê Xoce, li ser vê yekê ji ber deriyê desthilatê fetilibû û çemika stûyê xwe xurandibû. Lê camêrê me daxuyand ku artêş úcaxa pêxember e û divê kes dev neavêje wê saziya pîroz.

Piştî van teq û rejan Lévdormik û Dêlegur bi hev re (li ser fermana fermî ya der barê evînê de) zewicibûn, na lo me dîsa xwe şas kir, hikûmet ava kiri-bûn.

Ev rewş, tenê sê mehan domiya. Pêşî Zeyneba Zer serserkî berî selek, sepet û tewaletê dan. Bi dû re jî Lévdormiko gindirî. Sebeb jî Devbilgilêzo bû, bi "Şerê dosyayan" ew wergerandin.

De îcar Gurêboz û Poznikulo-



yê ku di warê faşistîyê de serî ji Gurêboz standiye, her piştevan û heta pêşmîriyê wê zewaca fermî bûn.

Jixwe Gurêboz i pîr, ku êdî mêtî çeliqiye û Poznikulo yî kordunde, her şêwirdarê wan bûn. Bi saya serê wan, canik û camêr sê meh ancax bi hev re

qedandin û serî dan ser hev.

Di vê navê de kes bala xwe nade bayê ku ji Rojhilat ve tê û textê desthilatê dihejîne.

Xwediyê Nifteya Bihuştê, piştî pelîşîna hikûmetê, destûra avakirina hikûmetekê jî Bavo stand ku ew li "Qesra

Rêbiran" dimîne. Dibêjin Bavo çaxa ku şivan bûye, teyrik berdane ji bo hilbijartina padîşahiyê. Teyrikê min û we jî çûye li ser serê vî şivanî daniye. Ew roj û iroj e ku, ew camêr li vir dimîne.

Tiştîkî din jî heye ku ew ne bi destê xwe ye. Serokê rîbir, heramxur û xwînrijan ci bibêje, ew bi ya wî dike.

Em bêne ser Bihuştîyoyê xwe, ku niha derî bi derî digere da ku bi yekî re şîrîkatiyê bike. Lê kes newêre silava Xwedê jî lê bike. Şerûd ji Bihuştîyo ne xwes in. Tew tê gotin ku ew şerûd jî ne bi serê xwe ne. Kesêni di ser wan re jî hene.


Li hêla din Gurêboz û Poznikulo demekê bernavkê wî "lawikê Reş" bû, xwe nadine ber hikûmeta ku Bihuştîyo ava bike. Heta Gurêboz gote ku şerûd naxwazin Bihuştîyo bê ser hukim. Poznikulo, li ser avakirina hikûmetekê jî bo hilbijartînê biisrar e.

Bihuştîyo li ber Delêgurê, Lévdormiko digere, ji wan lavahiyan dike ku pê re şîrîkatiyê bikin. Li welatê Bavo ku me got ew berê şivan bûye, ne siyaset, rejîm qefiliye û çerxa wê bi ger na-keve.

Bayê Rojhilat ew qerisandiye. Pê hesiyane, lê li xwe danaynin.

SILÊMANÊ KAL

## XELAT...



### Bersiva Xaçepirsê (20)

Xaçepirsâ me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihijin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 22'an kasetta **Koma Agirê Jîyan 'Adarê'** ye

#### Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava quityîn li bin xaçepirsê de binivisin û tevî adresâ xwe ji me re bişînin.



Kesêni ku xelata xaçepirsâ 20'an, kitêba **Gürdal Aksoy** "Tarihi Yazılmayan Halk Kürtler" qezenc kirine: Fikret Arda/Diyarbakır, Osman Doğan/Antep, Mustafa Çolak/Konya, A.Selam Duran/Tarsus, **Mahmut Yurcu/Mardin**, Yaşar Tarhan/Siirt, **Ahmet Öğer/Söke**, Mehmet Sancak/Bartın, **Mahmut Ergül/Batman**, Ali Uğur/Van

## XACEPIRSA BIXELAT (22)

Ciyayek Serokê PKDW'ê (wêne)	Notayek Bajarvani	Bi erebi kurd Termek komputurê	Gelo	Sembola Hidrojenê Sikûnet	Nexweşineke xwîni
Sewalek	Agir Navek	Col Hunermen deki kurd			Bang
Cureyeki maran				Naveki jinan	
Jin li çavê xwe didin		Keça ap Yezdanekî Misri			
Gîhanekek	Sebzeyek Bekoyê ...	Hejmarek		Rojek Şaneke esaletê ya îngilizan	5
Filmeke Spielberg Deng, melodi	Dadmend Xoşewista Memê Alan				
Înand	3	Rêxistina Neteweyen Yekbûyi Nikel	6	Kinivîsına Doktor	
Yan					
Iraq					



PEYVA VEŞARI



1 2 3 4 5 6



# Gurê boz ji gulê çi fêm dike!

**G**ur ji gulê çi fêm dike! Dema mirov gulan ber bi guran ve dirêj bike, gur gulan nabîne. Sedem ew e ku nikare ïxanetê li nijada xwe, li navê xwe bike.

Navê wan gur e, navê nesneya li dijî wan jî gul e. Ma kê dîtiye ku guran gul bêhn kiriye, an jî di nava baxçeyê gulan de, bi ruhberên din re bi aştî, jiyaye? Ma gur ne ji wê nîjadê ye ku, dema striyek di canê hevalê wî re biçe û xwîn bibe, hemcinsen xwe jî ji hev û din parce parce dike û dixwe? Gur bi çavên aştî li kîjan ruhberên din nihêriye ku li gulê binihêre?

## Sorbûn sedemê dilbijokbûnê ye

Gul dema ji layê însanan ve ji aliyê aştîhezan ve, dirêjî guran dibe, mixabin rengê gulê sor e û sorbûn jî gur hê bêhtir dilbijok dike. Rengê gulê ew seriyên bêlaş ên gerîla ku jêkirine û di destê wan de û ji tamarê wan xwîna sor dinique tîne bîra wan. Çavê wan tûj dibin ber bi gulê ve, dilê wan bi lerz lê dide û zimanê xwe yê dirêj, li dora devê xwe yê ku xwîna hişk pê ve ye digerîne, bêaram dibe, da ku êrif bibe ser gulê.

Niha di derê biharan de li deşt û çiya û zozanan û quntarêni çiyan, gulê reng bi reng vedibin û dibişkîvin. Hin gul aştiyê, hin gul rizgarî û azadiyê, hin gul jî evîna jînê, evîna welatê bêpest û pêkutî sembolize dîkin.

Ji wan gulan, di vê biharê de, li çiyayê Gebarê, li Cûdî, li çiyayê Licê, Dara Hênê, li çiyayê derdora Pasûrê jî reng bi reng vebûne. Çiyayê Kurdistanê bi kesk û sorê xwe seranser xemilandine. Bi her awayî bêhna aştî, azadi û rizgariyê ji wan tê.

Navê wan Egît e, Mazlûm e, Hogir e,

**KT, bi artêşa xwe ya bi nav û deng, tevî cihşikên Bakur, hin caran jî cehşikên Başûr, bi doxa koling û bêrên xwe girtine û xaka li dora zinar dikolin. Lî belê sed mixabin her ku xakê ji dora zinar didin alî ,ew diçin xwarê û zinar li ser serê wan hê bêhtir berz û bilind dibe. Ev yek jî di demeke gelekî nêz de, wê bibe sedema qetîna zirava dilê wan û dawîlêhatina jiyana wan a nepaqij û biqirêj.**

Rizgar e, Çiya ye, Rojin e, Arjin e, Mizgin e, Bêrivan e. Dîsa guran ev gul dîtin û dîsa kezebêñ sor, xwîna sor û goşte sor hate ber çavên wan; dîsa erîş birin ser gulê aştiyê. Lî ïcar gul ne gulê berê nerm û li gorî devên gurê devbixwîn in. ïcar histri bi wan ve şîn hatine. Xwestina xwarina gulê, dibe sedema rijîna xwîna gur.

Ger gur ji gulê bêşîtrî fêm nekir, divê mirov gulê bisitîrî dirêjî gur bike. Gurênu ku xwîna wan bê rijandin, wê ji layê hemnîjadêñ xwe ve bêne xwarin.

Komara tirk li nava dilê Rojhilata Navîn li Kurdistanê, dîsa bêhna bingehavêtineke şoreşê bihîstibû. Lî nedizanî bû bi çi cureyî qewîn hatiye avêtin.

## Nokerên di xizmeta guran de

Mîna bîst û heşt carêñ bihûrî, rahêşt bêr û kolingen dan ser pişt û stûyê nokeran. Carekê em "no" vegefînin kerê bihêlin, ango barê xwe li kerê kirine û destavêtine rehkolandin û qedandinê, ku li ser vî cure karî bûne pispor. Berê xwe dan lêgerîna koka şoreşê. Bêaramî, dilê wan lê diket û devê wan digot bîst û neh.

Li ser vê yekê jî mirov meseleya di navbera kumandarekî ûrisa Çar û Lenîn bîne bîra xwe. Lenîn, dema dibistana dawîn dixwîne li nava dibistanê û li dervêyi dibistanê jî têkoşîneke ramyarî (siyasi) dide meşandin. Kumandare Çar bi vê rewşa

DUMPLISK

WELAT

Rojnameya Hefteyi  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMÎ TAN  
RAHMÎ BATUR

Berpîsê Karêñ  
Nîvîsaran  
(Yazî İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELEDIMİR

NAVNIŞAN  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
(0 212) 293 53 19,  
251 90 13  
ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
Birleşik Basın Dağıtım  
(BBD)

NÜNERİTYEN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpâye:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost

Berlin:  
Silêman Sido  
49-30-69002695  
Hannover:  
Selîm Biçük  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884  
Bruksel:  
Medeni Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564  
Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Remzi İlhan  
312 06 32 31 28  
Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

BIRÜSK ARJİN

# Berhemeye dîrokî: Kela İshaq Paşa



**b**erhemeye dîrokî di navbera nifşan de wekî pirekê wezîfe dibînin. Her xêzeke li ser avahiyekê ji bo ronîbûna dîrokê hebek çavkanî ye. Dîroka kurdan ew qas dewlemend û bi bingeh e ku iro em rîçikên dîroka xwe li her devera cîhanê dikarin bibînin.

Kela İshaq Paşa jî yek ji cihan e ku di dîroka Bazîdê de cihekî girîng digire. Ew kelepora ku bi sedan sal hebûna xwe parastiye dixwaze bi sedan salen din jî jiyana xwe bidomîne, lê di bin talan û cerdê de wê çiqas bidome ew jî ne diyar e.

Vê avahiya dîrokî ji aliye mîmariyê ve jî bi cudatiya xwe ya ji avahiyen herêmê, bala pir kesan kişandiye, wan xwestine ku li ser wê lêkolinan çebikin. Heta salen 1986'an bi hezaran biyan dihatin li Bazîdê bi rojan diman. Hatin û çûyîna biyanan a herêmê, li ser gel bandoreke baş çedikir. Ew dibû sedem ku gel, li nirxên neteweyî û kurdîtiyê xwedî derkeve.

Lê, piştî ku tevgera azadiyê li herêmê dest bi livbaziyan kir, biyanen ku dixwestin li herêmê biggerin û der heqê avahiyen kevnare de bibin xwedî agahî, tûsi astengiyen hêzên dewletê di hatin.

Li gorî hin çavkaniyan Kela İshaq Paşa di salen 1400 û 1500'i de hatiye avakirin, li gorî hin çavkaniyan jî dîroka kelê bêhtir kevn e. Dîsa li gorî ku çavkaniyan, avakarê kelê İshaq Paşa ji Hindistanê hatiye li herêmê bi cih bûye. Ji ber nirxên misilmaniyê ew bi gelê kurd re wekî kurdeki jiyaye û dest bi

avakirina kelê kiriye. Kel li gorî plana ku İshaq Paşa daniye bi temamî çenebüye, piştî ku İshaq Paşa miriye, kurê wî Mehmûd avakirina kelê domandiye. Lê li gorî plana ku bavê wî danibû dîsa jî bi temamî çenekırîye.

Ji aliye din ve lêkolîmer, arkeolog diyar dikin ku mîmariya kelê bi mîmariya ku Urartuyan, Medan, Hîftan bi karaniye re wekî hev in. Rolyefen ku li ser dîwaran hatine çekirin û bikaranîna serê mirov, şer bi giyayan re, di mîmariya Urartuyan de tê dîtin û ev jî sembola pîrozbûna hisê mirov, nîşan dide.

Ji aliye çekirina kelê ve bikaranîna keviran û hostatiya wê jî ji hunera li ser kevirên Exlatê yên sor û spî dixuye. Kele ji çend qisman pêk tê; qesir, xwarinxane, aşxane, cihê razanê, medrese,

zindan, cihê ku bazirgan lê bikaribin bistirin, goristan û mizgeft.

Heta tê diyarkirin ku kesen ermen, yêzid an ji olên din bûna jî dikaribûn biketana kelê û heta ji bo ku ew jî bikaribin ibadet bikin, cih hatibûye çekirin. Lê iro tiştekî wisa di nav kelê de nayê xuyan.

Kela İshaq Paşa jî wekî her kevnareyên dîrokî yên Kurdistanê para xwe ji talan û cerdê hildaye. Di şerê cîhanê yê yekemîn de ûrisan deriyê wê yê zérin birine, iro li muzyea Lenîngiradê ye. Dewleta tirk jî bi sedan berhemên bêemsal jê dizîne iro li muzyea Enqereyê ne.

yonê (ji nû ve çêkirinê) de, dewleta tirk taybetiyen kelê bi temamî xera dikin. Armanca wê jî tunekirina berhemeye dîroka kurdan e.


## Bandora kelê li ser gelê herêmê

Hatina biyanan gelê Bazîdê bi her awayî diguherand, hem ji aliye aborî hem jî ji aliye civakî ve. Çêbûna hotêlén modern, pasajen mezin gel ber bi modernbûnê ve dibirin. Ev jî dibû sedem ku gel bi fikrên welatparêzî li nirxên kurdî xwedî derkevin.

Di destpêka şoreşa rizgariya Kurdistanê de bi sedan xort û keç çûne nav refen gerîla. Di navbera salen 1990 û 1993'an de li nav Bazîdê şerîn giran di navbera gerîla û hêzên dewletê de pêk hatin, rîçikê şer hê jî li ser dîwaran in. Gelê Bazîdê bi awayekî din jî welatparêziya xwe nîşan da ku di hilbijartînên dawîn de ji HADEV'ê re tevî astengîyan, tehdîtan û qedexeyan %80 ray derket.

## Mêvanên Kelê

Dîsa li gorî dîrokzan û lêkolîneran bi sedan birêveberen dewleten Rojhilat Navîn û kurdên di dîroka me de cihen girîng girtine hene. Ji biyanan Şahê İranê Şah İsmâîl, Çar Pedro, Yavuz Selîm Paşayê Osmanî, Racayê Hindistanê û hîn gelek kesen ku em navê wan nîzanin li vê derê bûne mîvan. Ji kurdan jî Ehmedê Xanî, Simko, İhsan Nûrî Paşa, Seîdê Kurdi hin kesen navdar in ku hatine vê deverê.



Peykeren ku ji dar hatine çekirin, li ser riya ber kelê ne.